



Taktîkên gerîla teknîka artêşa tirk têk dibe

Hevpeyvîn: Neşmîl Qasimlo:

Tevgera Bakur ji yên
din moderntir e

Rûpel 8-9

Dr. Kemal Sîdo Kurdaxî:

Welatê çiyayên berz
û newalên kûr

Rûpel 4-5

Memed Drewş:

Jûwîna şarê mawa
bena nezdî

Rûpel 15

NAVEROK



6

Azad Şîrîn: Welatparêzekî kezebşewat, şehîdê birûmet



7

Azad Avaşîn: Xelatên Çapemeniya Azad hatin dayîn



10

Jana Seyda: Helbestvanê filistîni, Mehmûd Derwêş

Ji Xwendevanan

BERÎ niha bi çar salan, tunebûna akademi, fêrgeh, dibistan û perwerdehiya bi zimanê kurdî, dibû sedema nivîsandineke amatorî. Lê destpêkirina weşana rojnemeya Welat bûbû kulmek ava cemidî, ji bo gewriya wî mirovê ku ji tîna biyê nexweşê li ber mirinê, piştî domaneke temen kurt, ji layê mijokdaran ve rojnemeya Welatê Me jî hat dadan. Piştî demeke kurt dîsa Azadiya Welat li ser bingeha Welat û Welatê Me dest bi weşan û jiyana xwe ya bi rûmet kir. Helbet ev rojname guh û çav e ji bo gelê kurd.

Belê ger-ev rojname çav be, divê çavêkê herî bi şewq û guheka herî vekirî û bihîstyar be. Da ku gel bi vî çav û guhî li dijî pîrsgirêkê û gelşan, neçe kambaxî û nekeve xeletiyên. Niha wekî min li jor jî anî zîman, ev çar sal in weşana rojnameyê xwerû bi kurdî berdewam e.

Nivîskar û rewşenbîr di destpêkê de ger çiqas di nivîsandinê de amator bin jî, pêwîst e ku di pêvajoyêkê dîndirê de di borandîneke çarsalan de bi gavên mezînan bi pêş bikevin. Lê hê jî pêşketin û guhartînekê berbiçav û pozîtîf nehatiye afirandin. Ger guherandin afiribe jî, ev guhartin bersiva pîrsgirêka nivîsandina bi kurdî nade.

Daxwazî min ji rewşenbîr û nivîskaran ew e ku piştî nivîsa xwe nivîsîn, carekê jî li naverokê û zîmanê nivîskî hûr û kûr vekole û di ber çavan re derbas bike.

BIRÛSK ARJÎN



"Bênnavberdayîn" kurdî

SAMÎ TAN

Dewleta tirk, dît ku bi kuştinê nikare rê li ber geşbûna doza kurdî bigire, li şûna ku dev ji politîkayên xwe yê jengarî berde, êrişî xwe ya li dijî çand û zîmanê kurdî tûjtir dike. Bi taybetî piştî ku hikûmeta MGK'ê hate serkar, digel "perwerdehiya 8 sal bênavberdayîn", dibistanê herêmî yê bi razangeh (Yatılı Okul) ji bo pişaftina zarokên kurd anîn rojevê.

Niha tê gotin ku wê ji bo pişaftina zarokên kurd, fêrgehên berî dibistana sere-tayî li Kurdistanê vekin. Rojnemeyên tirk, di nûçeyên xwe de, navê "Li Başûrê Rojhilat bênavberdayîn tirkî" li vê projeyê kirine. Di heman nûçeyê de tê gotin ku wê li van fêrgehên zarok hînî "tirkîyê xweşik" bibin.

Sedemeke vê helwesta dewleta tirk, tîrsa wê ya li hemberî geşedana zîman û çanda kurdî ye. Piştî derketina rojnemeya Welat niha bi hezaran xwendevan û nivîskarên zîmanê kurdî çêbûne û çend weşanên mehane, sê mehane dest bi we-

şanê kirine. Di wî warî de gava herî mezin vebûna televîzyona kurdî, MED-TV bû. Tu hewlên dewleta tirk ên ji bo girtina MED-TV'yê bi ser neketin û di ser de jî maweya weşana vî televîzyonê dirêjtir bû. Bi taybetî bi roj di televîzyonê de bernameyên ji bo perwerdehiya zarok û mezînan tînan weşandin. Pîraniya gelê kurd êdî ji bilî nûçeyan, qet berê xwe nadin televîzyonên tirkî. Ji ber vê yekê her wekî çawa ku gel dibêje, "Agir bi dawa dewletê ketiye", êdî nizane çî bike.

Li hemberî vê helwesta dewleta tirk, hê jî gelek kurd bi girîngiya zîmanê zikmakî ya di warê kesayetiya neteweyî de negihîştine; pihê bi zîmanê tirkî girtine, bernadin. Dema yek rexneyan li wan digire jî, "dibêjin heval zîman negirîng e, tiştê girîng bawerî ye." Bi dîtina baweriya kesên wiha, hinekî dişibe kesên oldar ku haya wan ji olê xwe nîn e; bi tenê wekî karekî toreyî nimêja xwe dikin, rojiya xwe digirin.

Divê em ji vê xewnerojkê hişyar bibin,

fêm bikin ku neteweyek bi hin taybetiyên xwe ji yê din vediqete û zîmanê zikmakî hêmaneke bingehîn a netewebûnê ye. Dijmin dema zîmanê xwe dixê devê mirov, bi vê yekê re mejiyê mirov dîl digire. Piştî vê yekê êdî hêsantir dikare bîr û baweriyên xwe bixê serê mirov. Bêyî haya mirov jê bibe, kesayetiya mirov li gorî van bîr û baweriyên teşî digire. Piştî ku di vî warî de dijmin digihîşt doza xwe, êdî li gorî dilê xwe mirov bilîze.

Divê em kurd vê yekê baş bixin serê xwe û li hemberî van kirinên dewleta tirk, hê zêdetir li zîmanê xwe û zarokên xwe xwedî derkevin. Li hemberî kampanya wan a bi navê "bênnavberdayîn tirkî", em jî kampanyaya bênavberdayîn zîmanê kurdî bidin destpêkirin.

Her wiha divê em xwedî derketina li zîmanê xwe bi axaftinê sînor nekin, divê em xwe hînî xwendin û nivîsandina bi zîmanê xwe bikin. Lewre tiştê mayînde xwendin û nivîsandin e. Bi xwendin û nivîsandinê digel ramanên mirov, zanîna mirov ya li ser zîmanê jî bi rêkûpêktir dibe. Dema mirov bi zîmanekî bixwîne û binivîsîne, heke derfetên axaftinê bi dest nekevin jî, mirov wî zîmanî jî bîr nake û dema derfet çêbûn mirov dikare di demeke kin de hînî axaftineke rawan bibe.

Raştiya dînan û nêzanayî

SERDAR BEDIRXAN

Amorê Azadiya Welatê 84'in de Celalettin Yöyler quncika xê de, "Nanê şarî wenê, la belê rastî nêvanê." nûst bi.

Nuştoxî nûst bi ke di kesî bawermend estê; jew zana yo, jew nêzana yo. Tesîrê dînan de jî di bêj (kesî)ê; yew erênî, o bîn jî neyinî yo. Bado jî, Seyda Yöyler vano ke, heqîqetê dînan de bandora neyinî çînyo. Kesê bawermend ebi tepiyamendey (peytmendey) û nezane yo; kesê alim zî, ebi fikrê xo yê xirab, bandora olanê neyinî anê meydan.

Demey (tawey) verî, mi waşt ke ez a mana bimûsa, coka ez fikiriyawa û pey ra mi xo rê vat, "ez şîra yew mizgeft, milay ra pers bikrî, o zî komî rê vajo." Mi keye de desmajê xo girot, ezan diya û ez şîya mizgefte, mi civatî miyan de nimajê xo kerd, ma dest bi tizban kerd.

Ez ewnaya mila ra, xora kokim bi, erdîşa ey spî bî, la balê xo ser bi, şalwarî payde bi, çubey ey sero bi, mi xo bi xo vat: "Ko êno milayo gurey mi biyaro ca?"

Civat bi vila, mi elifba girot, mila pey de vinderta, mi dî ke mila û yew mîrîkiya, raya kirdkî xeber dano, mîrîkî destê xo, xo ver de tepîştî bî, serey

Seîdê Norsî kurdan rê nasîhatê xo de vano: "Biwanê, biwanê, biwanê!" Heme çî wenden reydi beno, kê mîrdîmê nezan ra nê eşkenê behsê heqîqetê dîn jî bikê.

xo jî milay ver de kerd bi çewt. Zaf kêfê mi ame ke milawo kirdkî zano.

Mi raya mila pawit û mi vat: "Mila eşkenê mana enay de ti mi rê vajê?"

Mila mat mend, xo rê vejiliya, tizbeyê ke ci dest de, eşanay, pey ra vat: Ena ewk a (wina wa)... muhîm niya. Mana aye çîno, qandê gedan (qeçek) ra mûsiyeya, semed bänderbiyayîne herfan a, îta nivîsyaya ke gedey pê herfan bimûsê, tabî her çî ebi mana wo, la muhîm niyo.

Qalanê ey ra mi zana ke o erebkî nêzano. Ma piya mizgeft ra vejîyay.

Mîrîk hema zî destê xo pêsera nêaqitnay bî. Sewalê xo milay ra fîna pers kerd. Mi wîni ê halî miyan de ca viyar da.

Ez enka xo rê pejmîriyana, vana, çîmdê ê mîrdîmî de qedrê qîmetê ay mila çendî zaf o, qet bira fikr nêkerdo ke mila sewalê mi nêzanawo.

Ez fikiryena, sek ez ay mîrdîmî rê mana ay vajo, o qet baweriya mi nêkono. Sek tirkî vanê, "erdîşî mi çînya ke, qala mi bêro goşdarîn."

Celalettin Yöyler nivîsê xo de vano ke, rastiyê dîne îslamî şarê kurdan ra nêvajîyeyo. Rast vano, la nika ra pey, vajîyo tesîr ey beno? Ek şar wendê bo û zanaye bo, bişîno aqlî xwî bişuxulno, ay wext tesîr o wext beno, nê nêbeno.

Seîdê Norsî kurdan rê nasîhatê xo de vano: "Aqlê xo tanekanê şêxan û axayan de xo ra vejîyê, dekê serê xo" înan ra vano: Biwanê, biwanê, biwanê!

Herê!, heme çî wenden reydi beno, kê mîrdîmê nezan ra nê eşkenê behsê heqîqetê dîn zî bikê.

Demey ke ez yew embazê welatheskerdox ra persaya: "Çî rê hizbêkontra şarê ma miyan de endî rew hêz biyo, nê rexneyê înan heqtê şoreskeran de rast ê? Ê vanê enî ateîst î, hemver dîn î."

Ey vat: Rexneyê înan rast niyê. Labelê iyê şarê ma, ebi namey Hûmayî û dîne îslamiya xapeynenê.

Mi vat: Ek şoresgerî hemver dîn niyê, çîra şarî ra êna nêvanê?

"Şoresgerî hemver dîn niyê, la dîn zî terefê înan ra nêamew şixuliyayîn, me-la nikay ra pey eno jî bibo."



LI GORÎ daxuyaniyeke Sendikaya Karkerên Tenduristiyê (SES) şaxa Enqereyê, dewleta tirk di nav 50 dewletên ku pirtirîn pere li çekan xerc dikin de, di rêza yekemîn de ye. SES ragihandiyê ku Tirkiyeyê di navbera salên 1991-1995'an de 8 milyar 96 milyon dolarê Amerîkî ji bo standina çekan xerc kiriye. Dîsa di rapora SES'ê de gotin ku mirov dikare bi pereyên balafireke leşkerî, 16 nexweşxaneyên tekûz bide çêkirin. Her wiha tê gotin ku, bi heman pereyî zikê 400 hezar kesî salewest mirov dikare tîr bike. Hê jî Generalên tirk ji bo modernîzekirina artêşê qala 25 milyar dolarî dikin.



ROJA 28'Ê rezberê Navenda Çanda Mezopotamîyê 6 saliya damezirandina xwe li avahiya şaxa Beyoğluyê bi şahiyekê pîroz kir. Di destpêka şahiyê de ji avabûnê ta îro danasîna NÇM'ê tevî kom, şax û berhemên wê hatin nasandin. Piştî re danîşana sînevîzyonê ku dîtin û ramanên kesên ji gelek derdorên di derheqê NÇM'ê tê de cih digirtin, hate nişandayin. Beriya ku komên muzîkê yê cur bi cur ji bo konserê derkevin ser sehneyê lîstikeke bi navê "Zarokên Apê Musa" ji beşdaran re hate pêşkêşkirin. Şahiya ku bi xwarinên kurdan ên ku ji hêla Yekîtiya Malbatên Mezopotamîyê ve hatibû çêkirin bi axaftina Seroka Giştî ya NÇM'ê Nuray Şen qediya.

NÛÇE

Taktîkên gerîla teknîka artêşa tirk tîk tîk dibe

Çapemeniya tirk da zanîn ku Partiya Demokrat a Kurdistanê li hemberî êrîşên PKK'ê nikare li ber xwe bide, artêşa tirk li ser daweta PDK'ê çûye hawarê. Serokê Giştî yê PKK'ê di nirxandina xwe ya li ser vî tevgera dagirkeriyê de da xuyakirin ku artêşa tirk bêplan û tevdir bi zora PDK'ê ketiye Başûr.

Başûrê Kurdistanê çî ji ber rewşa xwe ya siyasî û çî ji ber xurtbûna piştgiriya gel, her diçe ji bo Partiya Karkerên Kurdistanê dibe cihekî girîngtir. Li gorî şewirmendê berê yê MÎT'ê Prof. Mahir Kaynak li başûrê Kurdistanê PKK'ê hêza herî xurt e. Artêşa tirk 26'ê rezberê dîsa bi 20-30 hezar leşkeran kete başûrê Kurdistanê.

Li gorî ragihandina karbidestên dewleta tirk, armanca operasyonê, berbandkirina amadehiyên PKK'ê yê ji bo zivistanê ne. Li aliyê din tê daxuyandin ku, Partiya Demokrat a Kurdistanê li hemberî êrîşên PKK'ê nikare li ber xwe bide, artêşa tirk li ser daweta PDK'ê çûye hawarê. Serokê Giştî yê PKK'ê di nirxandina xwe ya li ser vî tevgera dagirkeriyê de da xuyakirin ku artêşa tirk bêplan û tevdir bi zora PDK'ê ketiye Başûr. Dîsa li gorî nirxandina serokê PKK'ê, heke artêşa tirk neketa Başûr wê Mesûd Barzanî bireviya.

Artêşa tirk Zaxo parast

Çapemeniya tirk îdia dike ku artêşa tirk rê li ber êrîşeke PKK'ê ya li ser Zaxoyê girtiye. Heman çavkanî didin zanîn ku artêşê bi vî yekê rê li ber hin gavên di warê Kongreya Neteweyî de jî girtine.

Li gorî ku şarezayên navneteweyî diyar dikin armanca artêşa tirk firehtirîna "Kembera Ewlehiyê" (tampon bölge) ye. Li gorî agahiyan dewleta tirk dixwaze vî herêmê bike 8 km. Di heman demê de şarezayên siyasî bal dikîşînin ser rapora DYA'yê ya li ser Iraqê, ku berî vî bi çendakî hatibû diyarkirin û didin zanîn ku ev operasyon ji aliyê kî ve jî li ser daxwaza Amerîkayê hatiye li darxistin.

Lewra jî welatên wekî Rûsya, Fransa, Yewnanîstan, Suriye, Iraq, Îran, û Yekîtiya Ereban ev operasyon şermazar kirin, lê welatên wekî DYA û Brîtanya bîdeng man.

Digel daxuyaniyên desthilatdarên

dewleta tirk, yê der barê tîkbirin û kuştina PKK'iyên de êdî nivîskarên tirk ên herî dewletparêz jî bawerîya xwe bi vî yekê naynin. Nivîskarê rojnameya Milliyetê Sami Kohan ku bi nivîsên xwe yê li ser diplomasiya dewleta tirk, tê nasîn, di mîjûya 27.09.1997'an de di quncikê xwe de, tevî ku ev operasyon wekî "xweparastina" dewleta tirk bi nav kir û rexne li dewletên ku vî operasyonê şermazar dikin, girtin jî, da zanîn ku PKK bi van operasyonan tîk naçe. Li gorî Kohan divê gavên girîng di warê diplomatîk de bî avêtin, lê Tirkiye di vî warî de di tengasiyê de ye. Wek tê zanîn berê bi civînen Dublîn û niha jî bi yê Enqereyê DYA, Brîtanya, Tirkiye û PDK'ê xwestibûn PKK'ê li başûrê Kurdistanê tîk bibin. Lê bi ser neketin. Wekî diyar e YNK jî hevdiînen Enqereyê vekîşiyaye. Niha YNK dide zanîn ku ew operasyon, pêvajoya aştiyê dixin talûkeyê, lewre jî vekîşîna hêzên tirk dixwaze.

Helwesta rêxistinên Bakur

Li layê din, dijberî û reaksiyonên li dijî operasyona artêşa tirk tîj dibin. Yekîtiya Demokratîk ya Kurdistanê, ku ji YNK, Partî Sosyalistî Demokratî Kurdistan, Partî Zehmetkêşanî Kurdistan, Bizûtnewey Demokratîsxwaz û Partî Muhafazakarên Kurdistan pêk tê, bi daxuyaniyekê bang li hemû rêxistinên kurd kir, ku li dijî artêşa tirk derkevin. Di daxuyaniyê de wisa tê gotin: "Artêşa tirk bi banga PDK'ê xaka pîroz a Kurdistanê dagir kiriye."



Dewleta tirk ji bo ku li hemberî gerîlayên PKK'ê bi ser bikeve, bi hemû hêz û teknîka xwe şer dike. Lê ev 14 sal in bi tu awayî jî bi ser neket.

Lê, digel vî daxuyaniyê, helwesta rêxistinên bakur a li hemberî PDK'ê balkêş e. Partiya Yekîtiya Sosyalist a Kurdistanê (PYSK) di daxuyaniya xwe ya li ser dagirkerî de dide zanîn ku ew êrîşa dagirker bi banga PDK'ê pêk nehatiye. Dewleta tirk dixwaze bi vî yekê, armanca xwe ya rastîn veşêre. Lê li aliyê din tê ragihandin ku PDK der barê operasyonê de agahdar bûye û ev pesend kiriye. PYSK vî helwesta PDK bi şermokî şermazar dike. Heman rêxistin PKK û PDK bi qasî hev, wekî berpirsê şer nişan dide.

Her wiha berpirsên Partiya Sosyalist a Kurdistanê (PSK), der barê operasyonê de pîrsên me bersivandin. Li gorî berpirsên PSK'ê, bi vî operasyonê armanca bîgehîn a dewleta tirk berbandkirina bîhêzbûn û bicîhbûna PKK'ê li Başûrê Kurdistanê ye. Rêveberên PSK'ê wiha berdewam kirin: "Lê, hin partiyên kurd jî, bi şer û pevçûnên xwe fîrsend dane Tirkiyeyê, her wisa jî dane Îran Iraq û hinên din ku destê xwe bixi-

ne nav karên kurdan ên hundirîn û bi hêsanî êrîş bibine ser başûrê Kurdistan." Her wiha berpirsên PSK tevî YNK û PDK, şerê PKK û PDK wekî şerê birakujiyê bi nav kirin û gotin, şa-şî gelek in û ne yek alî ne.

Prof. Kaynak: PKK hêza herî xurt e.

Li aliyê din şewirmendê berê yê MÎT'ê Prof. Mahir Kaynak der barê sedema operasyonê de daxuyand ku, bi pêşbîniya wî ev operasyon jî ber ku PDK li hemberî PKK ketiye tengasiyê, ji bo piştgiriya PDK'ê hatiye sazîkirin. Kaynak axaftina xwe wiha domand: "PKK li Iraqa Bakur hêza herî xurt e. Tirkiye dixwaze PDK'ê li ser piyan bigire. Lê ev tiştê zor e. Bi dîtina min ev di demeke dirêj de jî pêk nayê." Prof. Kaynak li ser helwesta YNK jî diyar kir ku ew piştgiriya PKK'ê dike û heta di nava PDK'ê de jî gelek alîgirên PKK'ê hene.

MAZLÛM DOĞAN

General Helmuth von Moltke: Welatê çiyayên berz û newalên kûr

Li Xerpêtê bi xwe fêrbûna leşkerî li ser piştên malan dihate kirin, çimkî tu pehniyeke din li vî bajarê çiyayî tune bû. Gava ku em vegeirîn mal, pêşe (paşê) gelek fistiqên helebî, xoxên hişkirî, sêvên Meletiyê û hungiv, ji çiyayên vê deverê diyarî me kirin.



Wêne: Qeraxa Çemê Ferêt (Ji pirtûka Moltke ya bi navê Nameyên Moltke yên Tirkiyeyê)

Sal 1838... generalê Alman Helmuth von Moltke digihêje Kurdistanê. Wekî ku ji nameyên Helmuth Von Moltke tê xuyakirin, ew di destpêka meha adara 1838'an de gihîştîye Kurdistanê. Tê texmînkirin ku ew bi karwanê xwe ve li cihekî di navbera Meraş û Meletiyê re derbasî Kurdistanê bûne.

Piştî ku Helmuth von Moltke digihêje Keban-Madenê (16.3.1839), ew wisa behsa rêwîtiya xwe dîke:

“Di çolistanê ji berfê ya wêjeyî re em derbas bûn û roja 14'ê mehê em gihîştin Hasançelebî. Xaniyên vî gundî di ser hev re ne, her xaniyek jî xaniyê din re dibe sewkiyek û piştên xaniyan di sirtêkê de ne. Gava mirov ji vî alî ve tê, nikare xaniyekî jî xaniyê din ferq bike. Carekê, gava ez di ser xaniyekî re derbas dibûm, piçek mabû ku ez di pîxarê

re di salona malekê werbim. Vê bûyerê ez gelekî tirsandim. Lê dema ku me piştî taştê meşa xwe berdewan kir, karwanê me bi rewaniyeke xweş di ser piştê xaniyên gund re derbas bû. Me şeva xwe li Hekîmxanê qedand. Ew jî kekeleyek e; û dora wê bi dîwarekî hatiye girtin û li wir nêzikî danzdeh xanikan, mizgeftêk û hemamek heye.

Me li cem walî hêwirgeheke baş, kozikeke bi alaf, xaliçe, rûçik û balifên nerm dîtin û her wiha me xwarineke xweş jî xwar. Efendiyê pîr, wekî nişaniyeke rêzgirtinê, bi min re şuşeyek Xeresê vexwar; walî ecêb mabû, wekî ez bi nêrîzan nên dixwim, wî jî çetelên min re wisa digot.

Roja 15'ê mehê bi zehmetiyeke mezin derbas bû, min şanzdeh saet bi efendiyê xwe yî qelew re derbas kir. Bi rewaniyeke pîr bilez em di newaline zinarî re derbas dibûn û digihîştin sirtine

ne hew qas bilind, serên wan bi berfê hatibûn dagirtin; walî tu hest bi ciwanîya deverê nedikir û bi derbasbûna her saetekê re zîn û berdeha nermik bi wî hişkîrî dibû û derd û kulên wî zêde dibûn. Min soz dayê ku eger îro em xwe bigihînin Madenê, ezê şuşeyek şempanya vekim. Lê dîsa jî rûyê wî bi ken nedibû. Me şeva xwe bi rê de li gundekî qedand, lê mêşmoriyan wê şevê tu xêr bi min nekirin.

Hîn ji bilindahiyê Uğurluoğlu ve, li jêr binara çiyayekî berz, çemekî mezin jî me ve xuya dikir, ew çemê Ferêt bû. Piştî niv saetekê, bi siwarî, em daketin newaleke zinarî ya kûr; ev dever her ku diçû kuvîtir dibû û şiklên çiyayên mîna şepolên behreke bi hêrs bûn. Tiştêkî hêşîn li van çiyayên xuya nedikir. Ne kelemek, ne çawîr û ne jî çîmen... lê dîsa jî ev dever ne yekrengî bû, ew pîr ciwan bû, dîwarên zinarî yên reş, sor qelakirî û mor, kelemên di ber gelî re bi

şivên xwe yên hêşîn, berfa spî li serê çiya û di ser hemûyan re ezmanekî ronik û safî. Li jêr, ji dûr ve çemê Ferat xuya dikir, ew çemê ku împaratorên romanî wekî tixûbekî siruştî ji dîgela xwe ya bê dawî re hesab dikirin. Li vir hawîrdor hew qas kuvî ye, her du kenar bê çandîni ne û çiya jî bê rêk in ku mirov dibêje qey ev der dawîya dinyayê ye.

Bajarokê Keban-Madenê tenê ji dûr ve xuya dîke. Ew bajar li ser binara zincîreke zirav ji çiyayên diranî dimîne, ew çiya rê li çem digirin û nahêlin ku ew reterast biherike. Li jor, bi qasî saetekê ji vir dûr, her du av tevlihev dibin:

Ava Mûradê, ya ku ji Araratê diherike û Ferat bi xwe yê ku ji aliyê Erzerûmê ve tê, çemekî mezin pêk tînin, yê ku li havînan ji bi asanî nayê derbasîkirin. Pehniya Ferêt li vir 120 gav in û ew gelekî kûr e jî.” (r. 217-220)

Roja 19.3.1839, Helmuth von Moltke ji Parêzgeha Leşkerî ya Torosê, ji Mezra nêzikî Xerpêtê dinivîse:

"Em ji Keban-Madenê daketin û di newaleke kûr de sê saetan derbas bûn û gihîştin devereke nizim, lê gelek bi sirt. Cih bi cih gundên kurdan dihatin xuyakirin. Berfê hîn serên latikên çiyayên tûj dagirtibûn û rêka me jî ne her gav ji berfê azad bû; çiqas em bi pêş ve diçûn, hew qas ev welat bi latên volkanî yê reş, yê mîna çiranûsên cadeyekê yê hilçirandî, mişt bûbû. Lê dîsa jî li vir zad hatibû çandin. Li ber êvarkî dûzahiyeye fireh bi gund û rezên ku bi rêk û cobarên avê hatibûn parvekirin, sîngê xwe ji me re vekir. Li nav van çiyayên rep û rût, dilê mirov tenê bi spîndar û dargûzan xweş dibû. Gundên vir dewlemend xuya dikin, xaniyên wan bilind in û bi kelpîç û heriyê hatine avakirin, ser wan jî bi dîrekan (sitûn) hatiye girtin; ji rêxê maline tamam ava kirine. Di nîve deştê de sirtekê bi dîwarên xwe yê zinarî serî hildaye. Xerpût bi kela xwe, çend minaran û hemamekê ve li serê wî çiyayî vedibrûse; Hinekî dûrtir zincîreke ji çiyayên diranî, bi berfê dagirtî, hawîrdora bajêr digirin.

Bi qasî nîvsaetekê ji bajêr dûr, li gundê Mezra em peya bûn. Niha li vir parêzgeha serî dimîne. Ew avahiyeke mezin ji heriyê ye, banên wê jî pehn in, hewş bi nobedariyeke biçûk, xizmetkarên pir, teteran... û segmanan hatiye dagirtin. Generalê serdar li vir rûdine. Di odeyê bilind, bi dîrekan sergirtî de çavên min li pêşe ketin. Li hundirê odeyê xaliçeyên gewr hatibûn raxistin.

Xaliçe her wiha bi dîwaran ve jî hatibûn daleqandin. Pencere jî bi kaxetê hatibûn benîştirin. Bi dîwêr ve çek û sîleh daleqandî bûn. Li ser dîwaran jî komek ji nameyan hatibû belavkirin, yê ku komik bi komik pêçayî, bi benîkan girêdayî û bi şimaya sor hatibûn rişmekirin; mase, kursî, komidin, neynik, perde û pêwengên din ên ku bê wan çênabe, li vir wekî li koşkên tirkan ên din jî, gelek hindik bûn. Lê li vir hejmareke mezin ji xizmetkar û serbazan heyê, yê ku destên xwe li ser sîngê xwe di ser hev re birine û bi hurmet û bêdeng li ser piyan sekinî ne. Paşa li ser erdê; li ser postekî pilingan, lingên xwe kiribûn bin xwe û rûniştibû; wî

pir e; ew digel şandeya ku çûbû Rûsya pênc salan li wir mabû. Her wisa jî, ew li Skodra, Albaniya jî mabû û sêzdeh mehan li dijî albanîyan şer kiribû; piştî mirina Reşîd Paşa li Diyarbekirê sultan ferdandariya leşkerê torosê, ya ku di wê demê de di şerê li dijî kurdan de bû, kire destê Hafiz paşa, lê armanca Hafiz Paşa ya sereke çavdêriya artêşa Misiriya-Sûrî bû." (r.220-222)

Moltke şevêkê li parêzgeha Hafiz Paşa dimîne û roja din berê xwe dide Xerpûtê. Ew di nameyêke xwe de dinivîse:

"...Em siwar bûn û me da dû Hafiz paşa û çûn qîşleya mezin, ya ku li bina-

Ava Muradê, ya ku ji Araratê diherike û Ferat bi xwe yê ku ji aliyê Erzerumê ve tê, çemekî mezin pêk fînin, yê ku li havînan jî bi asanî nayê derbaskirin. Pehniya ferê li vir 120 gav in û ew gelekî kur e jî."

mantoyekî heşînî bi berstûk, ji postê pişikî li xwe kiribû û kumekî qêlib li serê wî bû. Xulam, bi hejandineke serê xwe bi xêrhatina me kir û nîşan da ku em rûnin. Piştî rawestanekê wî ji me re gôt: "Hûn bi xêr hatin!"

Hafiz Paşa di eslê xwe de çerkez e, ew ji bo sultan hatibû kirin û ji ber vê yekê ji hevkarên wî yê din baştir hatibû perwerdekirin; ew dikare bixwîne û binivîse; hinekî zimanê farisî û erebî dizane; piçek zanîna wî li ser dîroka kevn a welêt jî heyê û hewesa wî li ser

ra Sirta Xerpêtê dima û nîv saetekê ji vir dûr e, piştê Hafiz Paşa ew qîşle ji bo şeş hezar peyayan dabû avakirin; dema ku em gihîştin wir her kes bi fêrbûna leşkerî ve mijûl dibû. Li Xerpêtê bi xwe fêrbûna leşkerî li ser piştên malan dihat kirin, çimkî tu pehniyêke din li vî bajarê çiyayî tune bû. Gava ku em vegehin mal, pêşe (paşê) gelek fistiqên helebî, xoxên hişkirî, sêvên Meletiyê û hungiv, ji çiyayên ve deverê diyarî me kirin." (r. 222)

Li vir pêwîst e em çend gotinan li

ser Hafiz Paşa bêjin.

Hafiz Paşa wekî ku Helmut Arndt jî behs dike kurê serok eşîrekî çerkezan bû, ew hîn biçûk bû gava tirkan ew ji bo sultan kiribûn û anîbûn Seraya Stenbolê. Piştê navpilê axa dabûnê. Di qirkirina yenîçeriyên de roleke Hafiz Paşa ya mezin hebûye û ji ber vê yekê baweriyaya sultan bi wî xurtir bûbû. Hafiz Paşa wekî serhengêkî di cenga tirkan û rûsan ya 1828-29'an de beşdar bûye û piştî îmzekirina Aştiya Adrianopolê tevî şandeyekê çûye St. Pêtêrsbûrgê. Tenê li Rûsya Hafiz Paşa gihîştibû wan baweriyên ku dezgehên welatên ewrûpî ji yê osmaniyan pêşketî in û tirk tu carî zora rûsan bibin. Hafiz Paşa demekê li Albaniya mabû û li dijî albanîyan şer kiribû. Di sala 1836'an de ew bûbû ferdandarê sereke yê leşkerê Torosê.

Piştî şikestina osmaniyan di şerê Nîsîbê (Nîzîb) de Hafiz paşa hate girtin û ew dane dadgeha leşkerî; ew hatibû tawanbarkirin çawa ku wî şer daye destpêkirin. Lê Hafiz Paşa di dadgehê de nameyêke Sultan Mehmûd dabû xuyakirin, ya ku sultan tê de fermana destpêkirina şer dabû. Ji ber vê yekê ew hate berdan. Piştê ew bû waliyê Erzeromê. Di sala 1843'an de Hafiz Paşa bû waliyê Belgradê. (r.388-89)

**AMADEKAR Û WERGER:
DR. KEMAL SÎDO KURDAXÎ**

Jêrenot: Hinek şasiyên ku di nivîsa min a hejmar 84, r.8-9 de çêbûne: Li cihê "li ser rîya Hindîstanê" Ingilîstan derketiye. Navê Mîr Mihemed bûye Mîr Mehmûd û li cihê Meraşê jî Dilûk derketiye.

Em ji kê re dikarin bibêjin "Şoreşger"

CELALETTİN YÖYLER



Hevalên hêja, xwendevanên delal, di hejmara Azadiya welat a 86'an de, me nixandinek li ser peyva rewşenbîriyê û rekên rewşenbîran, anîbû rojevê. Di vê nivîsa xwe de, em dixwazin ku peyva şoreşgeriyê hildine dest û bi hûrnêrineke civakî û zanistî binixînin. Belê ev peyv hema li cem pirên kesên ciwan, siyasetvan, nivîskarên gelê kurd, bi taybetî tê xebitandin.

Em werin ser navêkoka vê bêjeyê. Wateya naveroka bêjeyê, serhildan û têkoşin e, li hemberî hinek bûyerên ku diqewimin; ji bo pêşveçûna mirovahiyê li cur bi curên deverên cîhanê. Livbazî û têkoşina şoreşgerî jî, bîrek ji serhildanê şoreşgerî ne. Wekî çawa ku bibêjin: Xwepêşandanên girseyî li hemberî kirinên dagirkerî û nijadperestî û ne mirovahiyên ku li ser neteweyekê bi xwînrijandin û zêrandin tene meşandin. An jî li hemberî wê tevgera dagirker, rewşenbîrên wî gelê bîndest, bi pênuşên xwe, bikevine nava têkoşina

nivîskî.

An jî bi têkoşina çekdarî, kesên wî gelê bîndest, wê dagirkeriyê ji ser xwe û welatê xwe bidine paqijkirin û rakirin. A bi zanîna me ev e wateya têkoşina şoreşgerî. Pêxemberê me Mihemed (Silava Xwedê li ser be), bi vê wateyê wiha dibêje: "Ew kesê ku xirabiyek, nerindiyek, ji yekî dît, divê bi destê xwe êrîş bike ser wê xirabiyê û wê ji holê rake. Eva jî baweriyaya (îmana) herî mezin e. Lê heger nekarî bi destê xwe rake, divê bi devê xwe, jê re bêje: 'tu xirab î.' Heger bi devê xwe jî nekarî bêje, divê bi dilê xwe jê nefret bike." Belê li hemberî xirabiyaya dagirkerî û nijadperestiyê, tevgera şoreşgerî ya çekdar, li cem ola me misilmanan jî, pir bi rêz û rûmet e. Lê em kesên kurd ên ku jî xwe re dibêjin şoreşger, gelo em çi dikin? Em bi qelesa xwe, an bi xwenîşandanên girseyî, an bi karê rojnamegerî, doza wan şêr û pilingên ku pêxemberê îslamê Mihemed (Silava Xwedê li ser be) ew wekî qencîrînen mirovahiyetê bi nav kirine, dişopînin an na? Bi rastî hinek ji me (kurdên qeşmer) ji wateya şoreşgerîyê derketine û bûne hevalbendên dijminê neteweya xwe. Hinek jî bi navê şoreşgerîyê ji xwe re hinek ji berhemên neteweyî û nixên wan ên hêja diweşînin û çap dikin û bi wan pereyan jî xwe re pir pir araqan vedixwin û

bi qîzikên wekî xwe re, dilîzin. Kesên bi vî awayî jî, ji sedî yek û nîv in. Ew tu demê doza şoreşgerî ya çekdariya ku bilind bûye û xwe gihandiyê ser serê "Agirî û Sîpan"ê jî, napejirînin. Hem jî bo alîkariya pêşvebirina doza neteweyî ya welatê bîndest jî, tu xwepêşandanên girseyî jî, ne li welat, ne jî li derveyê welat li dar naxin.

Bi ser de jî destpêka îxaneta vê salê li Başûr; hetanî vê rojê, yekî ji wan ên ku bi derwan xwe dinepixinin û dibêjin; em jî şoreşgerên kurd in, negotine ev îxanet e. Gelo çima nabêjin; gazîkirina dagirkeran li ser axa welatê pêdewskirî û namûs û nixên neteweyî ne îxanet e? Lewre ew xwe di neynika dêwan de dibînin û "çavnebar û dexes in" ji şoreşa pir mezin a ku di welat û qada navneteweyî de bûye xwedanê rêz û rûmeteke herî mezin, ewên çavnebar jî, nekarine xwe bigihînin vê radeya bi şeref û rûmet.

A bi van nixandinên li ser peyva şoreşgerîyê em dikarin bêjin, şoreşger ji wan kesan re tê gotin ku ji dil ji can yek ji beşên şoreşgeriyê pejirandibin û çavnebariyê naxin. Bi ser de yê dibêjin têkoşina wan hevalên min pîroz e, lewra em her du jî, ji bo armanckî têdikoşin, a şoreşger ew kes in. Ji bilî vê dîtine kesên ku ji xwe re bêjin şoreşger, xwe dixapînin, ne şoreşger in...

Welatparêzekî kezebşewat şehîdê birûmet



Cengîz Demir

Em hê zarok bûn, tê bîra min gava ku qala apê Mehmûd dikirin digotin, "Mehmudê Ezîz kurdçî ye." Apê Mehmûd bi Mele Evdilayê Timoqî û Mele Cahfer re heval bû. Ez diçûm dibistana seretayî, dikana Apê Mehmûd a xeratiyê, di devê riya min de bû, tim civata wî geriya bû, Apê Mehmûd bi dengê xurt û bilind ji civatê re helbestên seydayê Cigerxwîn dixwendin, di ber re jî karê xwe dimeşand.

Apê Mehmûd malbata xwe baş perwerde kiribû, zarokên wî, nebiyên wî, heta bigihêje birayên wî û xwişkên wî jî, bi doza gel hişyar bûn. Ez dixwazim tesîra wî ya ku li ser zarokên wî çêdibû, mînakekê bidim. Di sala 1975'an de bi navê Elî nebiyekî Apê Mehmud çar salî hebû, Apê Mehmûd pir jê hez dikir; Elî jî ji kalê xwe naqete, sibehekê tev de diçin ku herin kolanê, xeta hesin riya trêne li ser riya wan e, wê keliyê trêne ji Amedê tê Batmanê Elî çima ale sor ku di pêşiya trêne de çikandî nabîne, dibêje:

— Kalo ev trêna me kurdan e.

Apê Mehmûd dibêje:

— Na, Eliyê min, ev trêna mijokdarên ku dewlemendiya binerd û sererdê me tev talan dike, dibe rojava. Elî dibêje: "Çima li pêşiya wê ala rengîn çikandî bû." Elî jî ne neheq e, di çûn û hatina trêne de ala sor di pêş de çikandî ye.

Apê Mehmud piştî emrê xwe yî navsere jî di newroz de wekî xortekî hêvde-hêjde salî bi hez û kêfxweş bû. Wî di newroz de xwe azad dihesiband, pir caran bi taybetî newroza xwe pîroz dikir. Diçû li ser serê çiyayê Ramanê agirê newroza xwe

Piştî şhadeta Cengîz li bajarê Batmanê şhadetan her roj dewam kirin. Dilê Apê Mehmud keliyabû û difûriya, betilî bû, qedandin jê re pir zehmet bûbû, Apê Mehmûd, ketibû nav livînan roj bi roj halê wî xerab dibû, xwendanê dabû ser avê. Apê Mehmûdê ku wekî betlekî gir, ew zend û bendên wî yên bedew mîna teyrekî baz ku per û baskên wî bişikên lê hatibû.

pê dixist. Piştî ku xortê kurdan ên xwendekar hêza şoreşgeriyê xurt kirin, Cejna Newroz jî bi tevayî ji aliyê gel ve hate pîrozkirin. Sal 1978 bû, li Batmanê tevî komek heval, navrojê ji me re got: "Emê agirê Newrozê li serê kolan û li nivê çareyê pêxin, emê newrozê pîrozkin, me listik gihandin cih û bîdonek benzîn jî pê de kir, berî ku me dit apê Mehmûd jî baz dide ber bi me tê û çiwalek xertok dagirtiye, anî avêt ser û got ku ev jî para min e. Tu nabêjî cihê çalakiyê nêzî dikana wî ya xeratiyê, me agirê xwe pêxist sloganên xwe avêtin û tev de bêlav bûn.

Apê Mehmud 65 sal kiribûn, lê rihê wî rihê xortan bû. Dema 12 rezberê derbeya faşist Apê Mehmûd jî wekî gulekê çilmisî bû, dost û hevalên wî, lawê wî hatibûn girtin. Bi taybetî wekî ku hêviyên wî hatibûn girtin. Tê bîra min, ji Girtîgeha Amedê roja ku ez derketim gihîştim malê, yê ku yekemîn hatibû cem min Apê Mehmûd bû. Piştî derbeya faşist heya 15'ê gelawêjê Apê Mehmûd jî wekî aveke payizê zelal û melûl melûl jiyana xwe didomand; heya 15'ê gelawêjê ku mizgîna xêre hat, ji Botan germa wê da hemû welat, Apê Mehmûd jî dilgeş bû, qelew bûbû, civata ku lê rûnişt tu kesî nikaribû pê re nîqaşê bikira, mirovekî pir bi aqil bû û bersivên wî amade û di cih de bûn. Li Batmanê û hemû welat serhildanan dest pê kiribû, dijmin jî şaş mabû ew qas zilma wî pere nekiribû, dijmin dest bi şerekî qirêj û taybet kiribû.


Li bajarê Batmanê jî rojê 5-6 xortê kurd dihatin kuştin, lawê Apê Mehmûd î biçûk Cengîz xortekî 23 salî bû, lê Cengîz ji gefên kontrayan neditirsiyan û



Bavê Cengîz, Mehmed Demir

tevî hevalên xwe yên şoreşger ku li taxa koxika çî bikirana, wî jî bi wan re berxwedana xwe dida, Cengîz xeyala dijmin zû dikişîne, lê ew welat û têkoşînê li dijî şerê qirêj û kontra bernade. Rojekê feleka xayin li deriyê mala Apê Mehmûd jî dixê, çira mala wan jî ditefîne, li serê pirê kontra kemîn danîne, Cengîz wê rojê çeka xwe hilnegirtiye, kontra wî gulebaran dikin. Cengîz hebekî li ber xwe dide ku baz bide, lê dora wî girtine xelas nabe û digihêje şhadetê. Gel diçe taziye Apê Mehmûd, çarina pir kela wî tijî dibû, lawê wî Navî digot bavo tu bavê şehîdî ev rûmeteke mezin e.

Piştî şhadeta Cengîz li bajarê Batmanê şhadetan her roj dewam kirin. Dilê Apê Mehmud keliyabû û difûriya, betilî bû, qedandin jê re pir zehmet bûbû, Apê Mehmûd ketibû nav livînan roj bi roj halê wî xerab dibû. Apê Mehmûdê ku wekî betlekî gir, ew zend û bendên wî yên bedew mîna teyrekî baz ku per û baskên wî bişikên lê hatibû. Ew tişt ji ber xîret û welatparêziya wî hatibûn serê wî. Şevêkê xebereke reş li deriyê Nexweşxaneyê dixê û belav dibe heya odeya Apê Mehmûd tê, dibêjin: "Eliyê kurê Xelîlê Elesîsê sibehe gava ku dihere karê xwe, li devê deriyê xwe ji aliyê kontrayan ve hatiye gulebarankirin û şehîd bûye." Apê Mehmûd çawa vê xeberê dibihîze ji kezebê axînekê dikişîne, dibêje: "Dîsa mala min xera bû!" Piştî axîne hew his jê çêdibe, çavê wî tîn girtin. Rehma Xwedê li Apê Mehmûd û hemû şehîdên Kurdistanê be...



● 03.10.1994

Serokê HADEP'a Yüreğira Edeneyê Rebih Çabuk û Rêveberê HADEP'ê Sefer Cerf li taxa Mutluya Edeneyê li "Güneydoğu Kiraathanesi" yê ji hêla kontrayan ve hatin şehîdkirin. Di bûyerê de endamekî HADEP'ê bi navê Salih Satan jî birîndar bû.

● 03.10.1990

Dîwarê Berlînê hate hilweşandin. Almanya ya Rojava ya Rojhilat vegirt.

● 04.10.1993

Li başûrê Kurdistanê li bajarê Hewlêrê hikûmeta federe hate îrankirin.

● 07.10.1980

Dellîl Doğan di nav şerê Têkoşîna Rizgariya Kurdistanê de gihîştê şehadetê.

● 08.10.1930

Serhildana Pîlêmûrê dest pêkir.

AWIR

Xelata Çapemeniya Azad hate dayîn



Xelata duyemîn jî Şaban Dayanan ji destê kurê Apê Mûsa, Dicle Anter girt. Dicle Anter got: "Êdî ez jî Musa Anter bi tenê wekî bavê xwe nabînim, ew jî bo min jî Apê Mûsa ye.

Roja 28'ê rezberê li Navenda Çanda Mecîdiyeköyê xelatên pêşbaziya Musa Anter û şehîdên çapemeniyê yên sala 1997'an bi şahiyekê gihîştin xwediyên xwe. Ev pêşbazî yekemîn car di sala 1993'an de ji layê rojnameya Özgür Gündem ve hatibû pêkanîn. Xelata vê pêşbaziya kevneşopî ji ber ku çapemeniya azad ji bin çewsandina dewletê rizgar nebû, her sal ji hêla rojnameyekê ve hate dayîn. Piştî Özgür Gündem, Özgür Ülke, Yeni Politika, Demokrasiyê, îsal ev xelat ji hêla Ülkede Gündem ve hatin dayin.

Şahî û merasîma ku li Navenda Çanda Mecîdiyeköyê hate çêkirin bi konsera Koma Çiya dest pê kir. Piştî konsera Koma Çiya, ji bo şehîdên çapemeniyê deqîqeyek rawestîna rêzgirtinê pêk hat. Piştî wê Gerinendeyê Rojnameya Ülkede Gündemê yê Giştî Erdem Önal der barê girîngiya wê rojê de hin dîtin û ramanên xwe anîn ziman: "Di vê riye de armanca me ew e ku, em çapemeniya muxalif ava bikin û ramanên xwe bi vê yekê binin ziman. Şehîdên me divê riya zehmet de meşyan û hetanî îro hatin û em jî li ser şopa wan in." Dû re derbarê kevneşopîya çapemeniya azad de sinevîzyonek hate nîşandayin.

Piştî sinevîzyonê Xelata yekemîn a beşa wêneyan ku Aslan Uras qezenc kiribû, ji dêvla Uras ve Hikmet Fidan xelat ji destê Nacî Kutlay girt. Xelata duyemîn jî Şaban Dayanan ji destê kurê Apê Mûsa, Dicle Anter girt. Dicle Anter got: "Êdî ez jî Musa Anter bi tenê wekî bavê xwe nabînim, ew jî bo min jî Apê Mûsa ye.

Di beşa wêneyan de xelata yekemîn Selahatin Sönmez girt. Xelata wî jî ji aliyê Seroka Giştî ya NÇM'ê Nuray Şenî ve hate dayin.

Di beşa lêgerîn û lêkolînê de xelata yekemîn a Meryem Erdal ji aliyê lêkolîner û lêgerîner İsmail Göldaş ve hate dayîn. Xelata duyemîn Aytekin Yılmaz stand ji ber ku ew di girtîgehê de bû li ser navê wî, metika wî Şadiye Vural ji destê Işık Yurcu girt.

Xelata sêyemîn di nav du rojnamevanan de hate parvekirin. Yüksel Işık ji destê diya Ferhat Tepe Zübeyde Tepe xelata xwe girt, Serdar Doğan jî ji destê Rêveberê Înstîtuya Kurdî Kerem Soyulu xelata xwe girt.

Di beşa karikatûran de xelata yekemîn Ahmet Erkanlı ji destê Cigirê Sekreterê Giştî yê HADAP'ê Aziz Doğan girt. Di beşa karikatûran de xelata duyemîn hate îptalkirin. Xelata sêyemîn a Oğuz Gürel jî ji aliyê Endamê PM'ya HADEP'ê û bavê nûçegihanê şehîd, eYeni Ülkeyê Cengiz Altun M. Emin Altun ve hate dayîn.


Ligel van kesan, Trêna Aştiyê jî xelata rûmetê girt. Li ser navê Banga Honoverê Mahmut Şakar ji destê xwediyê Rojnameya Ülkede Gündemê Selahatin Deli xelata rûmetê girt. Her wiha xelata aştiyê ya jûriyê ya taybet jî, Kutlu Adalı ku li Kıbrısê ji layê kontrayan ve hate kuştin, girt. Jina Adalı xelata wî ji destê nivîskar Ragıb Zarakolu girt.

Di şeva xelatdayînê de gelek mesaj jî hatin xwendin. Bi giştî jî mesajên ji Girtîgeha Enqere; Hatip Dicle, Leyla Zana, Selim Sadak, Orhan Doğan, Serokê PKDW'ê Yaşar Kaya, Serokê İHD Akın Bırdal, Serokê Yekitiya Parêzkarên Kurdistanê Av. Veysel Akay, xwendekarên di greva birçibûnê de û mesajê Platforma Demokrasiyê ya Amedê hate xwendin, ji aliyê beşdaran ve bi coşeke mezin hate pêşwazîkirin.

AZAD AVAŞIN

ÇAVDÊRÎ

AMED TÎGRÎS



"Evvel Allah û piştî Bekçî Abdullah"

Ez mirovekî seyr (ecêb) im. Heta min dest bi dibistanê kir, min qet bi tirkî nizanibû. Piştî 12 salên dibistanê, vê carê ez bûm mûalime efendî, yanî mamoste. Hem jî mamosteyê tirkî. Vê carê min dest bi asîmîlekîrîna zarokên kurdan kir. Min dersa tirkî da wan.

Gelo dema ez bûm mamoste, min xwest ku ez tola (heyfa) xwe ji zarokên kurdan bigirim? Na!... bi hezar sondî ev ne rast e! Tu carî armanceke min a wiha tune bû û ev yek jî tu carî nehatibû bîra min.

Lê çi bû? Ez bûbûm karmend, karmendê dewletê. Bi zimanê xelkê ez bûbûm memûrê dewletê. Wey bavo ew çi payebilindî bû û di wê demê de ew bi dest her kesî nediket û nedibû qismet. Hingê kêmkî dikaribû bibê memûrê dewletê.

Di sala 1975'an de min li gundê Licê, li Cinezûrê mamostetî dikir. Ber êvarekê ez dê vegeyîyama Cinezûrê. Li sôkê Xalidê dêrxustî rastî min hat. Me soz da ku bi hev du re herin. Cinezûr û Dêrxust nêzîkê hevdu bûn. Bîstek paşê em ketin rê. Xalid dest bi axaftinê kir û êdî nedisekîniya. Em qederekê çûn, Xalid rexne li min kir û got:

-Xoce efendî, tu çima hew qas li dijî dewletê yî, Xwedê ji te razî! Dewlet we xwedî dîke û hûn bi ser de jî, li dij in. Divê mirov nankoriyê neke.

Min-xwest ku bersiva wî bidim; eybe-eyb ma Xalid dihêle û dewam kir:

-Xoce efendî çend meh paşê êdî ez jî dibim dewlet.

Min bi meraq pirsî:

-Xêr e, ma tu çawa dibî dewlet?

-Ma tu nizanî min qîza xwe da hevalê te Elî Xoce! Ew mamosteyê jî Pîranê.

-Ê!

-Ê, êêê...Lawê min Şîrîn jî îsal li Diyarbekirê lîseyê diqêdîne û dibe memûrê dewletê. Wê demê ez bi xwe dibim dewlet. Êdî ku ez nebim dewlet kî dibe dewlet? Ha ji te re law û ha ji te ra zava! Ma ne bes e?

Min bi ken: Bes e û zêde ye jî...çawa ne bes e! Heta tu bi xwe dibî bavê dewletê.

Ez fikirim ku ez dê dewletê çawa bi Xalidê dêrxustî bidim fêmkirin. Min çiqas jî got ku dewlet ne ez, ne, zavayê te Elî ye û ne jî dê lawê te be, ew îqna nedibû û digot: Bi Xwedê dewlet ez bi xwe me. Hem zava û hem jî law...

Piştî şeş-heft salan min dev û dest ji dewletê berda. Ne ji ber gotina Xalid, ji ber zordariya dewlata Xalid û feodalên me û yên herêmê. Ez nizanim Elî û Şîrîn hîn jî dewlet in an na? Lê tiştek heye ku ez baş pê dizanim dewletê gundê Xalid Dêrxustê, gundê ku min li wir mamostetî dikir Cinezûrê û gundên cîran Husênîr û Sisê şewitandin û xweliya wan da bayê.

Di dema me de, li Licê polis tune bûn, çend cendîrme û beqçî hebûn. Ez dixwazim ji wan behsa Bekçî Abdullah bikim, ka ew çiqas mirovê dewletê bû. Bekçî Abdullah cilên beqçîtiyê li xwe dikirin, kumê beqçîtiyê dida serê xwe û simbelên xwe yên palik badidan, her simbelêkî wî mîna rîsiya giya bû. Ew bi sükê diket û diqîriya:

-Evvel Allah û piştî Bekçî Abdullah. Yanî pêşî Xwedê û piştî re jî Bekçî Abdullah tê... Li gorî Bekçî Abdullah ji derî Xwedê tu kes jî wî mezinîr tune bû. Ne mudîrê emniyeta Tirkiyeyê yê giştî û ne jî serokfermandarê giştî yê eskerî...

Piştî 1990'î gerîla tîn Licê û di malê de bi cih dibin. Bekçî Abdullah bi wan dihesse. Radibe wek kovboyan çekê xwe digire, pêhn li derî dixê û dikeve hundir. Çek li wan rast dîke û diqîre: "Evvel Allah û piştî Bekçî Abdullah. Zû teslîm bibin." Gerîla lê direşînin û ling lê rep dikin. Yek ji gerîlayan jî birîndar dibe. Zivistan e. Derdikevin çiyê. Xwîn lê sar dibe û ew jî di rê de şehîd dikeve.

Belê, Xalidê dêrxustî û Bekçî Abdullah dewlet wiha fêm kiribûn. Ne bi tenê Xalid û Bekçî Abdullah, bi hezaran çahş û hinek jî xulamên dewletê ku ji xwe re vî karî wekî wezîfe dibînin. Hinek wekî Xalid difikirin û hinek jî wek Bekçî Abdullah dest davêjin çekan û li dij kurdan bi kar tînin. Her kes dewlet e û ji bo dewletê vî karî dikin.

Tevgera Bakur ji ye



Biraziya Evdirehman Qasimlo Neşmîl Qasimlo

Em dixwazin der barê apê we Sekreterê Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê birêz Evdirehman Qasimlo de hin pirsan arasteyî we bikin. Kesên ku ew kuştin ji aliyê Serokomarê Îranê Rafsancanî ve hatin berdan, hûn vê biryarê çawa dinirxînin?

□ Bi rastî ez hew qas ji vê bûyerê ne agahdar im. Tiştê ku ez dizanim, di sala 1989'an de apê min Qasimlo hate kuştin. Wê demê hikûmetê kujer girtine, lê pişt re berdane. Belê li ser Rafsancanî hin tiştên gotin, lê ji ber ku min lêkolînek nekiriye, ez ne xwediyê agahiyeke rast im.

Li gorî qaîdeyên Îranê ji bilî serokê dînî tu kes nikare fermana kuştinê nikare bide?

□ Didin li Mîkonos jî wan wisa kirin.

Hûn dikarin hinekî qala bûyerê kuştina apê xwe bikin?

□ Ez ji der ve pê hesiyam. Wê demê bi polîkayê re tu eleqeya min nîn bû. Piştî ku apê min di sala 1989'an de hate kuştin ez ketim nava polîtîkayê. Vêga li Almanyayê tîkiliyên min bi hin komeleyên ku bi kêşeya kurdî re elqedar dibin, hene.

Sedema çiyîna we ya Almanyayê çi bû?

□ Ez di zarokatiya xwe de felç bûm. Ji bo tedawiye malbata min ez şandim Almanyayê. Pişt re min xwest ku ez tipê bixwînim. Min xwend û niha jî li wê derê di warê psikolojiyê de bijîşkiyê dikim.

Hûn dixwazin, em vegeerî ser kuştina apê we?

□ Wî ji Îranê ravestîna şer dixwest. Berê jî du caran jî bi nûnerên hikûmeta

Heger Şah biketa, wê Xumeynî li Îranê sistemeke nû saz bikira û bi şeweyeke aştiyane wê kêşeya Kurdistanê çareser bikira. Bi apê min re wisa axivîbû. Piştî ku Xumeynî çû Îranê jî binî ve ramanên wî guherî û xwest ku apê min bikuje.

Îranê re li hev rûniştibû.

Hûn dikarin qala tîkiliyên Xumeynî û Qasimlo bikin?

□ Apê min û Xumeynî li Parisê hev û du nas kiribûn. Heger Şah biketa, wê Xumeynî li Îranê sistemeke nû saz bikira û bi şeweyeke aştiyane wê kêşeya Kurdistanê çareser bikira. Bi apê min re wisa axivîbû. Piştî ku Xumeynî çû Îranê jî binî ramanên wî guherî û xwest ku apê min bikuje. Apê min jî tîgihîşt

Di nav koma ku bi çalakiya "Trêna Aştiyê" re hatibûn Stenbolê Biraziya Sekreterê Giştî yê PDK-Î'yê Dr. Evdirehman Qasimlo,

Dr. Neşmîl Qasimlo jî hebû. Ew li Almanyayê dijî û wekî psîkiyatrist xebatê dike. Hevalên me Azad Altun û Mazlûm Doğan li ser aşî, rewşa kurdan û Dr. Evdirehman Qasimlo bi wê re hevpeyvînek pêk anîn.

ku Xumeynî dê wî bikuje, ew jî ji ber vê yekê ji Îranê dûr ket.

Der barê kuştina apê we de hin îddîa hene, yek ji wan îddîayan; dibêjin Qasimlo bi zanebûn bi ser mirinê de çû. Ev yek ji aliyê Deham Ebdulfettah ve li bûyera Simko tê şibandin. Hûn vê yekê çawa dinirxînin, çewtiya apê we çibû?

□ Vêga ez vê bûyerê jî derva dişopînim. Belkî ji hundir ve hin tiştên din jî hebûn. Apê min bawer nedikir ku wê Îran, an jî Xumeynî xwe bixin nava karên bi vî rengî. Wexta em diaxivîn me digot, dibe ku tiştêkî wisa biqewime.

Tîkiliya we ya bi siyasetê re di çi astê de ye?

□ Min nexwest ku ez bi rêxistînekê ve bîn girêdan. Hin ramanên min hene. Ez hin tiştan naecibînim. Ji ber vê yekê ez serbixwe me. Ez ji bo Leyla Zana di meha berfanbarê de hatibûm Tirkiyeyê. Me tevî hevalên xwe yê jin ên alman îmze kom kiribûn. Me xwest ku her yek rojekê jî dêlve Leyla Zana bikevin girtîgehê. Îmzeyên ku hatibûn komkirin me

taybetî hûn helwesta PDK'ê çawa dinirxînin?

□ Belê ez dizamin rewşa wir gelekî xerab e. Kurd bi hêza xwe ne ewle ne. Ji her alî ve zordestiyek heye. Ji ber ku ew ji hêza xwe bawer nînin, alîkariyê ji Îranê dixwazin, ji Tirkiyeyê dixwazin, tu carî nabin yek û şerê birakujiyê dikin. Li Ewrûpayê yê ku dixwazin alîkariyê bidin, dibêjin: Ev çî ye, jixwe rewşa we xirab e û bi ser vê yekê de hûn hev û din dikujin.

Bi awayekî giştî ewrûpayî ji bo kurdan çi difikirin. Wexta ku dibêjin kurd, çî tê bîra wan?

□ Ez li Ewrûpayê nizanim, lê kurd li Almanyayê şer dikin. Li Almanyayê di mitîngê de hin polîsan derb xwaribûn, rojnâme-yên almanî jî gelek cih dabûn vê bûyerê. Wexta ku em bi almanekî asayî re diaxivîn dibêje: "Ma hê ew ê çî bikin". Lê ez bawer im ku îmajê kurdan ji vir û şûn de wê biguhere.

Hûn li Ewrûpayê dijîn. Hûn der barê nêzîktêdayina rojavayîyan a jî bo kurdan çi dibêjin?

□ Gelekî kêfa wan ji kurdan re tê. Kurdan dilgerm û sempatîk bi nav dikin. Lê ji aliyê din ve rewşa kurdan wan xemgîn dike û dibêjin em dikarin çawa vê pirsgrêkê çareser bikin. Yanî ji bo kurdan xwedî hestên baş in.

Tîkiliyê we bi sazîyên kurdan ên li Almanyayê re hene?

□ Berî vêga komeke me hebû; Sisê ji başûrê Kurdistanê, çar pênc kes jî ji bakurê Kurdistanê bûn. Ji Kurdistanê Îranê tu kes nîn bû. Me xebatên xwe dikirin, lê vêga em belav bûn, niha ez serbixwe xebatê dikim.

Cihêrengiya tîkoşîna bakur ji perçeyên din çî ye?

□ Tîkoşîna herî dijwar li Tirkiyeyê tê kirin. Me li NÇM'ê dît gelek ciwan tevî vê tîkoşînê bûne. Strana dibêjin, govendê digirin, şanoyê dilîzin. Di dilê hemûyan de hêvî heye. Wexta ku ez çûme Başûr li rastê van yekan nehatim. Min li Rojhilât jî tiştêkî wisa nedît.

Hûn dikarin bibêjin ev tevger hê morderntir e?

Li Başûrê Kurdistanê şerek heye. Bi

Qasimlo, Dr. Nesmîl Qasimlo: Hûn din moderntir e

□ Belê ev tiştêkî diyar e. Li gorî tevgerên din moderntir e. Lewre dikare piştgiyariya kurdan bi şeweyekî hêsantir bi dest bixe.

Hûn Kurdistanêke çawa xeyal dikin?
□ Ya ku ez vêga dixwazim bila mafên mirovan bi cih bên. Ji bo rastbûna xeyala min herî kêr pêncî sal divê. Di vê demê de em xwe amadeyî otonomiyê bikin. Lewre hinga rewşa gelê tirk baş be, wê ji vê yekê re razî be. Hege rewşa tirkan ne baş be, kurd mafdar in ku çareseriyêke ji vê baştir bixwazin.

We pêşt got ku mafên çandî, pişt re mafên politîk....

□ Belê wekî filistinîyan bi şeweyekî azad em çî dixwazin, dixwazin çî bikin, ku gel biryara vê yekê bistîne. Xeyala min a herî xweşik jî pêkhatina yekîtiya kurdên Îranê, Iraqê û Tirkiyeyê ye.

Hûn li ser MED-TV'yê çî difikirin?
□ Min lê temaşe kiriye. Bi nêrina min MED-TV ji bo gelê kurd gaveke girîng e. Mirovan gelekî hêvîdar dike.

Hûn di ketina nava siyasetê de xwe derengmayî dihesibînin?

□ Ez bijîşk im. Nexweşiyên derûnî bi axaftinê derman dikim. Ez dixwazim navbertiyê bikim. Ne bi navbertiya partîyan. Ev yek hem jî bo jiyana min xeterê ye, hem jî di dilê min re tiştêkî bi vî rengî derbas nabe. Ez bi heyeta aştiyê re digeriyam, lê mixabin em bi tirkekî re neaxivin. Divê aştiya bi du aliyan pêk bê, bi-alîyekî çênabe. Min xwest ku ez bi tirkekî li kolanên Stenbolê re biaxivim. Di vê em ji cihekî dest pê bikin.

Tirk nêzikî vê yekê nabin...
□ Ez dizanim, lê divê em nêzik bibin. Tirkiye ji hêza xwe ne bawer e. Esas dikare hin gavan bavêje.

Me ji axaftina we wisa derxist ku hûn Tirkiyeyê ji Îran û Iraqê hê demokratir dibînin. Ew dikare ji van welatan bêhtir bi kurdan re li hev bike?

□ Ez nikarim bibêjim hê demokratir e. Lewre xwe ji derva re wisa dide nasîn.

Li gorî we ve, ev helwesta Tirkiyeyê ji dil e an na?

□ Heger ku ji dilbûna ev îhlalên mafên mirovan pêk nedihatin. Ji ber vê yekê ev ne demokrasiyêke rast e. Qanûn hene lê bi cih nayinin. Ji aliyê din ve li Tirkiyeyê bandora leşkeran gelekî mezin e. Ji ber zordariya leşkeriyê siyasatmedar jî nikarin daxwaza xwe pêk bînin.

Hûn nêzîktêdayina ewrûpayîyan ya ji bo îslamiyan çawa dinirxînin?

□ Ew rûpa ji îslamê ditirse. Dijminê îslamê yê herî mezin Îran e. Amerî-

ka ditirse ku Tirkiye bibe wekî Îranê û ji destê Amerikayê derkeve. Li Ewropayê jî bêhtir tirs fundamentalîzmê heye. Esas her dem bi tenê ji aliyê fundamentalîstan ve tê nirxadin. Îslamê baş nas nakin. Tiştêkî ku nas nakin bêhtir wan ditirsîne.

Em dixwazin, vegeherin ser Birêz Qasimlo. Birêz Qasimlo ji aliyê gel ve gelekî tê hez kirin. Li gorî we taybetiyên ku Qasimlo anîne vê astê çî ne?

□ Gava ku ez çûme Başûr demêke dirêj li wir mam. Tevî vê mayîne ez gelekî şaş mam. Yê ku pê hesiyane ez biraziya Qasimlo me hurmeteke mezin nîşanî min dan. Li Almanyayê kes Qasimlo nas nake. Gava ku ez çûme Başûr min dît ku di nav gel de gelekî tê hez kirin. Piraniya kesên ku bi dilzîzî û dilxweşî qala wî dikirin jî çînen bindest bûn.

Bo nimûne, zilamekî pîr dema çav li min ket, bi dest girî kir û got: "Piştî mirina Qasimlo, di mala me de sê rojan şîn hebû. Di radyoyan de jî şîn hebû." Gotinên wekî, heke ew hebûya wê meselaya me çareser bibûya, min ji devê wan bihîstin. Bi min ew mirovekî bi aqil bû û têrgihîştî bû. Mirovekî xwîn germ bû, xwe nêzikî gel didît. Li Ewropayê jî siyasatmedarên navdar nas dikirin. Di dema wî de ewqas alozî nîn bûn. Lê wê demê jî dîsa ew bi kurdan re eleqadar dibû.

Di malbata Qasimlo de kesê ku bi siyasetê re têkildar in hene an na?

Ez psikiyatrist im, gava ku mirov ji aliyekî ve ne azad be mimkûn nîn e ku jî aliyê din ve jî azadibe. Bandora vî şerî di pêşerojê de li ser nîfşên nû wê xwe bide der. Haya we jê nîn e. Hûmê pişt re tê bigihêjin ku şer çawa jî layê derûnî ve mirovan diguherîne.


□ Belê hene. Lê ne wekî serokê partîyan in.

Çend xwişk û birayên Qasimlo hene?

□ Heft xwişk û birayên wî hene. Ehmet, Elîxan, Evdîrehman, Huseyîn. Du xwişkên wî mirin. Xwişka wî ya dawî jî berî niha mir. Elîxan bavê min e, li Êrmiyê dijî. Ehmed jî li Ewropayê dijî.

Hûn cara dawî kengî çûn Êrmiyeyê?

□ Di sala 1994'an de ez bi tirs û dudilî çûm. Bavê min di girtîgehê de bû. Yanî di salên 80'yî de bavê min ji ber



Şekreterê Giştî yê PDK-Î Evdirrehman Qasimlo di sala 1989'an 13'ê firmehê de li Wiyanayê hate şehîdkirin.

Xumeynî reviya bû. Lewre Xumeynî dixwest ku hemû malbatê me bixe girtîgehê. Piştî wê bavê min vegeheriya Îranê, li Ewropayê nikaribû bijî. Ew kurdekî xwerû ye, nikare li cihekî din bijî. Vegeheriya û kete girtîgehê. Sê sal û nîvan di girtîgehê de ma.

Rewşa hemû mirovên ku îşkence dîtine xerab e.

Bi taybetî ji kîjan welatan tî?
□ Ji Tirkiyeyê gelek hene, lê ji welatên din jî hene.

Di dawiyê de tiştêkî ku hûn dixwazin bibêjin heye?

□ Nifûsa gelê kurd zehf e. Li gorî min gelekî ku hew qas zêde ye û di vê rewşê de ye, li cihekî din nayê dîtin. Em ji ewrûpayê jî bo aştiyê hatin vê derê. Aştiya biqasî ku ji kurdan re girîng e, ji tirkan re jî gelekî pêwîst e.

Lewre gelê tirk jî di bin vî şerê qirêjî de ji aliyê aborî ve dipêçiqe. Ez psikiyatrist im, gava ku mirov ji aliyekî ve ne azad be mimkûn nîn e ku jî aliyê din ve jî azad be.

Bandora vî şerî di pêşerojê de li ser nîfşên nû wê xwe bide der. Ji ber ku hûn niha bi şer re eleqadar dibin. Haya we jê nîn e. Hûnê pişt re tê bigihêjin ku şer çawa jî layê derûnî ve mirovan diguherîne. Yanî ji bo ku aştiya pêk bê, hê divê gelek tişt bên kirin.

(1): Qasimlo navê gundê ku Evdirrehman Qasimlo lê hatiye dinyayê ye. Ew li başûrê Êrmiyeyê ye.

Qasimlo⁽¹⁾ cihekî çawa ye?

□ Em jî wê derê tî. Qasimlo bi tîna xwe û xwezaya xwe gelekî xweş e. Mirov ji bo gerê û seyranê tîna Qasimloyê.

We berî niha got ku ez nexweşiyên derûnî derman dikim, di nav wan de kesên ku îşkence dîtine hene?

□ Belê hene. Rewşa derûnî ya nexweşên ku îşkence dîtine gelekî xerab e.

Rewşa yên ku ji Tirkiyeyê tîna çawa ye?

□ Ne tenê yên ku ji Tirkiyeyê tîna.

Helbestvanê filistînî Mehmûd Derwêş

Mehmûd Derwêş di nav ereban de wekî helbestvanekî şoreşger derdikeve pêş. "Li gorî helbestvanê kurd Jan Dost, Derwêş yek ji girîntirîn helbestvanê ereb e û şerê gelê Filistînê gelekî baş aniye zimên.

Di sala 1941'ê de li gundê Berweh nêzikî Akka ya Filistînê hatiye dinyayê. Di 7 saliya xwe da ji Filistînê bi dûr xistin. Piştî vege-riya û ji bo xebatên xwe yê siyasî li dijî Îsraîlê çend caran kete zîndanê. Xwendina xwe, li Moskovayê qedandiyê. Ew demeke dirêj berpîrsê kovara "Kermêl" bû. Gelek xelat wergirtine. Mehmûd Derwêş di nav ereban de wekî helbestvanekî şoreşger derdikeve pêş. Wî gotiye: "Di şerê de amûreke tûj bi bandortir e ji şîrekê, lê balafir jî nikare şîrekê bikuje." Li gorî helbestvanê kurd Jan Dost, Derwêş yek ji girîntirîn helbestvanê ereb e û şerê gelê Filistînê gelekî baş aniye ziman. Dîsa Jan Dost dide zanîn ku pêwistiya kurdan jî bi helbestvanên wisa heye.

Ji dîwanên wî "Evîndarek ji Filistîn", "Pêlên zeytûnê", "Dawîya şevê", "Gulên kêmtir" û hwd. Mehmûd Derwêş niha li Filistînê niştecîh e.

Ji Dîwana "Pelên zeytûnê" ya Mehmûd Derwêş, çend helbest

Li ser mirovekî

Zencîr li ser devê wî danîn
Destên wî bi zinarê miriyan girêdan
Û gotin: Tu mêrkuj î!

Xwarina wî birin
kinc û alên wî ew avêtin zîdana miriyan
Û gotin: Tu diz î!

Ew ji her benderê sirgûn kirin
yara wî ya biçûk revandin
Piştî gotin: Tu penaber î!

Ey kesê Çav û lep bi xwîn
Şev bi dawî ye
Ne girîgeh wê bimîne
Û ne jî zencîr
Neron mir lê Roma
ma û ma bi çavên xwe
şer dike û libên simbilan dimirin
wê newalê dagirin
ji simbilan

Hêviyek

Hîn di sênîyên

we de piçek hingiv maye
mêşan dûr bixinin
da hûn biparêzin hingiv

Hîn di rezên we de
goşiyên tirî mane
çeqlan bi dûr xînin
da tirî Şêrîn bibe

Hîn di malên we de
tejikek û deriyek mane
rê li ber bayî bigirin
da razên zarok

Hîn di dilên we de xwîn maye
nerêjin
êy bav û dê di hinavên we de
zarok hene

Hîn di agirdana we de
hinek êzing qehwe
û gurzek ji agir maye.

Girêdan

Em ji hev dûr nakevin
Li pêş me derya
û daristan li pişt me
Çawa emê ji hev dûr bikevin?
Dostê min çavreşo
min bibe, kesî min ji bilî te tune!

Dibe ku ji çavên te bêhêvî bûme
ey tiyo ta ebed!

Dibe ku ji destên te ditirsim
ey dilhişko ta ebed!
Lê ez bêkes im, bêkes!
çawa emê dûr bikevin
ji hev?

Ey xweşiktirîn hov hevalê mintiştek di navbera



min û te de tune
ji bilî dirûfî û tirsî
ji kelemên rê...
li pêş me derya
û daristan li pişt me
çawa emê ji hev dûr bikevin?

Li ser Berxwedanê

Ku bihata bîra zeytûnê
kê ew çandiye dê zeyt biba hêsir!

Ey şarezahiya bapîran
eger goştê me bûya jî
me yê ji te re bikira mertal
Lê deştî bayê tu zadî nade
koleyên xwe

Emê bi mijangan histirî û janan
rakin
Ta kengî emê xaç û şermezariya xwe
hilgirin
û felek digere emê bimînin
keskaya zeytûnê
û mertal li dora gerdûn.
Çavên te hevala

minî pîr hevala nûhatî
çavên te du parsek in
di şevê quncên xeniqî de
hêvî di wan de nakenin
û birûsk tê de ranakevin
Tiştê li ba me nemaye
ji bilî hêstên noqbûyî
Bêje: kengî tê carekê bikenî-bila bi derewan be jî?!

Her du lepên te hevala min
du gurê birçî ne xwîna min ya maye
bimije û bila lehî li me rabe...

Û ku tu carekê birçibûyî
laş mehêle
Em bi şaşî çêbûne
di xilmaşiyêke demê de
û tu jî hevala min a pîr
ya nûhatî li ser laşên meba
weka laleyên bindar.

AMADEKAR Û WERGER
JANA SEYDA



Hinek çalakî li navendên çandê
Li Navenda Çanda Mezopotamya ya Stenbolê

● **04.10.1997 Şemf:** Ji Bêşa sinemayê film: Kaos, derhêner: Her du birayên Taviani, saet: 14:00

Konsera Koma Agirê Jiyân, saet: 17:30

● **05.10.1997 Yekşem:** Konsera Hozan Mustafa, saet: 14:30

Konsera Koma Çiya, saet: 17:30

● **10.10.1997 In:** Ji Bêşa Sinemayê film: Kesên fesatkar, Derhêner: Her du birayên Taviani, saet: 18:00

LI BEKSAV'ê

● **04.10.1997 Şemf:** Gotûbêj: "Şopa Dewleta Binerdî: Susurluk", pêşkêşî: Av. Metin Kozan

Av. Yücel Sayman (Serokê Baroyên Stenbolê)
Av. Ergin Cinmen (Însiyatîfa Welatîyan)

Av. Ercan Kanar (Serokê ÎHD'ya Stenbolê)
Celal Başlangıç, (Rojnameger), saet: 14:00

● **05.10.1997 Yekşem:** Konferans: "Rêbaza Fikirinê" Cengiz Gündoğdu, saet: 15:00

● **06.10.1997 Duşem:** Film: "Komeleya Hozanên Mirî", derhêner: Robin Williams, saet: 18:30

AWIR

Li Kolnê banga aştiyê



Serokê Gişî yê PKK'ê Abdullah Öcalan: Desthilatdarên şerxwaz û xayinên me di nava xwe de yekîtiyeke xurt pêk anîne, divê em jî bi qasî wan bi xurtî li hemberî wan rawestin.

Ji bo rawestandina şerê gemarî ku ve 13 sal in li Kurdistanê tê meşandin û ji bo ku aşî bête lidarxistin, li Kolnê, 28'ê rezberê "Festîvala Aştiyê" ji hêla çend rêxistinên ve hate lidarxistin.

Derdorê 5 hezar kesên ku beşdarî şeva aştiyê bûbûn, li Sporhalleya Kolnê, ji hêla MED-TV'yê ve zindî hate weşandin. Dema mesaja serokê PKK Abdullah Öcalan, ji dengê wî hate pêşkêşkirin, komên xelkê sloganên mîna "Bijî serok Apo" avêtin. Öcalan diyar kir ku pêdivî bi aştiyê heye, lê dewleta Tirkîyê şerê gemarî bi piştgiriya Amerîka didomîne û axaftina xwe wiha domand: "Desthilatdarên şerxwaz û xayinên me di nava xwe de yekîtiyeke xurt pêk anîne, divê em jî bi qasî wan bi xurtî li hemberî wan rawestin, da ku em karibin karên girîng ji bo bi piştgiriya aştiyê û şerê şerxwazî ji bo parastina mafên komên xelkê bikin. Ji bo vê yekê pêdivî bi hatina cem hev û karên bi hev re heye. Ez vê bangê li aşîxwaz û hêzên şerxwazî dikim. Heya dawiyê em bi xwe ewle ne û serketin a me ye. Bêguman bi qasî serketina di şer de pêkanîna aştiyê jî wê bibe serbilindî û serfiraziya me."

Kesên ku axaftin kirin, ji Tirkîyê û


dewletên din yê Ewropayê hatibûn, piranî li ser têkiliyên dewleta Tirkîyê û mafiyayê rawestiyên, bal kişandin ser bûyera Susurlukê. Piştê jî bal kişandin ser pêdiviya aştiyê û da zanîn ku ji bo aştiyê jî têkoşin divê.

Kesên ku ji bo axaftinê beşdarî Festîvala Aştiyê bûbûn: Serokê ÎHD'yê Akin Birdal, Prof. Andreas Buro (alman), Parlamenter Cem Özdemir, Cîgirê Serokê ÖDP'ê Erdal Kara, Parlamenterê RP'ê Fetullah Erbaş, âktör Halil Ergün, Cîgirê Sekreterê HADEP'ê Mehmet Satan, Mustafa Düzgün, Selahattin Özel, hunermêhd Şanar Yurdatan, Tomris Özden û Yüksel Selek... Ji bilî axaftinên li ser aştiyê, dilok û stranên li ser aştiyê jî hatin pêşkêşkirin, kesên mîna: Ahmet Kaya, Ferhat Tunç, Beser Şahin, Belkis Akkale, Nilüfer Akbal, Koma Amed, Lale Mansur, Yavuz Bingöl, Erdal

Festîvala Aştiyê li derdorê saet 16.00'an dest pê kir, heya 24.00'ê nivê şevê dom kir. Di festîvalê de pir rêxistin û sazîyên kurdî bi standên xwe beşdar bûbûn. Ev festîval ji hêla Alternatîf Toplum Merkezî, Arkadaş Tiyatrosu, Türk Alman Kültür Formu, Taday û Et Jeth hate lidarxistin.

AZADIYA WELAT/BRÜKSEL

TÎŞK



BEKİR BAHOZ

Dîsan hêrş bo ser Başûr

Wek lay şarezayanî meydanî siyaseta aşkîra ye, le dayikbûnî hukumetî ANA-SOL-D (hukumetî Partê Nîştîmanî Dayik, Partî Çep î Demokrat û Partî Tirkîyê Demokrat), encamî janî dijwarî pêşbirkê nêwan berey dunyayî (îlmanî) û berey ayîn (Dîn) perweran bû. Be wateyekî tir, damezrandinî hukumetî niwê le katî kobûnewey rojî 28.2.1997 da nexşey bo kêrabû. Aştîxwazan û çawdêranî siyasî her çende wekû roj layan rûn bû ke hukumetî Yılmazîş wekû hemû hukumetekanî pêşû, tiwanay biryardanî niye le ser kêşey kurd, belam dîsan be hîwa bûn ke em hukumete helwêst binwênê û hengawêk le aşî nîzîk bêtewe. Belam her be zûyî aşkîra bû ke em hukumetêş le bazney daxrawî supa da dexûlêtewe û lewe biçûktir e ke le ser kêşeyekî çarenûssazî wekû kêşey kurd biryar bidat.

Eweta le mawey kemtir le nîw sal da, supay Tirkîyê be biyanûy rawnan û le nêw birdinî gerilakanî Partî Kirêkaranî Kurdistan (PKK), pelamarî xakî başûrî Kurdistan dedat û dagîrî dekat. Em car supay turk be nîzîkey 50 hezar şerbaz û deyan tank û zirêpoşewe hêrş dakete ser ew beşey welatî kurdan. Lêre da qîsey ême le ser ewe niye ku aya supay turk detwanê sinûrêk bo çalakî gerilakanî PKK dabînê, yaxûd na, çûnke xo eme carî yekem niye ku Tirkîyê hêrş dakete ser başûrî Kurdistan, encamîş aşkîra û le ber çaw e: Geranewey yekekanî sûpa be têkşkawî û be ziyânêkî zorewe û be hêztirbûn, ziyatirbûnî jimarey cengaweran ARGK. Boçî? Çûnke hemû hêrş û pelamêrî supay Tirkîyê bo ser xwarûy Kurdistan le sertaserî Kurdistan, hestî netewayetî û hestkirdin be dagîrkirdinî welat radey lêpirsrawetî beranber be parastinî xakî nîştîman lay lawanî kurd berz dekatewe, her boye be çawxişandin û giwê girtin le serçawey hewalkan, boman derdekewê le mangî gulane ta êsta be sedan law ke bêşî zariyan xelkî başûr in, peywendîyan kirdiwe be rîzekanî ARGK'ewe.

Pêwîst e eweş le bîr nekrê ke Tirkîyê peyta peyta radegeyenê ke hêrşî emcarîş her le ser daxwazî Partî Demokratî Kurdistan (PDK) pêk hênawe, PDK'îş berperçî em lédwananey lêpirsrawanî dewletî Turkî nedayewe, kurd witenî, bédengî be watay razî bûn e. PDK zor baş dezanê dewletî turk ku be agir û asin welamî daxwazî reway 20 milyon kurdî serûy Kurdistan dedatewa, be hîç şeweyek amade niye dan be azadî başûrî Kurdistan da binê, çûnke siyaseta dewletî Tirkîyê le ser binaxeye şîrînewey netewey kurd binyad nirawe. Belam ewey cêgay serinc e ew ye ke boçî PDK sûr e le ser hawkarî legel Tirkîyê û le ser şerkirdin dij be PKK? Ême hemû dezanî ke Tirkîyê, turkekanî Bulgaristan û çend hezar turkmanêk xwaruy Kurdistan be biray hawxwên û hawregezî turkekanî Tirkîyê dezanê, eme le katêk da be kurdekanî başûrî Kurdistanî xizm û kes û karî 20 milyon kurdî bakûrî Kurdistan (Kurdistanî Tirkîyê) delê-Xelkî bakûrî Irak. Her wekû çon be deyan sal kurdekanî bakûrîyan naw nabû "Turkî çiya", mewey du sê salîş e zarawey xelkî bakûrî Irakyan bo kurdî başûrî dataşîwe deyanewê cihanî pê tefre biden.

Ke ewe akar û rewşî û bîrî siyasî û stratîjî dewletêkî wekû Tirkîyê bê, êdî boçî debê layenêkî kurdî bikewête xizmetî ew rijême û le projey tiwanewey miletekey xoy da awa çalakane beşdarî bikatî? Pêwîst e zor baş bizanî ke mêjû hîç-biyanûyek qebûl nakat bo hawkarî legel dagîrkeran. Erki mêjûyî ser şanî hemû ew rêxrawaney ke emro her yeke û niwênarayetî gelfî kurd deken, ewe ye, dest bidene destî yek û be yek hêz û îrade berengarî nexşe pir le metirsiyekan dagîrkeranî Kurdistan binewe. Bizûtinewey rizagarîxwazî kurd lem qonaxe da le hemû kat ziyatir pêwîstî be darîştin û girtine berî stratîjîyekî hawbeş heye.

Her çende Kurdistan parçe parçe bê û bizûtinewey rizgarîxwazî le her parçe xawenî taybetmendî xoy bê, debê eweman le bîr neçê ke eme wekû kurd çarenûsman bend e be yekewê û bê yek natwanî keştî têkoşan bigeyenî: be kenarî azadî û serfirazî.

Çend mînak ji dûrikên dawetan ên BOTAN (2)

Yên

Hey yêlî yêlî, wey Heşeno yêlî
 Hey yêlî yêlî, wey maqûlo yêlî
 Çar çeka hilîne em biçin xêlî
 Hesik zava ye, xwedê bihêlî
 Hey qat e, Heseno qat e
 Hey qat e, maqûlo qat e
 Dasoka rake em biçin liqatê
 Hesik zavayê hîva sibatê
 Kurik zavayê hîva sibatê
 Hey pê de pê de, Temero pêde
 Hey pê de pê de, maqûlo pêde
 Neçe Xaxoyê, wey neyarê di rê de
 Neçe wêranê, wey neyarê di rê de
 Hesik kuştine, xwîn çû di cîzmê de
 Kurik kuştine, xwîn çû di cîzmê de
 Hey reş e reş e, Bagozê reş e
 Hey reş e reş e, wêranê reş e
 Xemla Bagozê şitl û zebeş e
 Xemla wêranê şitl û zebeş e
 Cewabek hatiye, Temo nexweş e
 Xeberek hatiye, Temo nexweş e
 Hey spî ye spî ye, Bagozê spî ye
 Hey spî ye spî ye, wêranê sipiye
 Xemla Bagozê şitl û pembo ye
 Xemla wêranê şitl û pembo ye
 Cewabek hatiye, Temo miriye
 Xeberek hatiye, Temo miriye
 Hey sor e sor e, Bagozê sor e
 Hey sor e sor e, wêranê sor e
 Xemla Bagozê şitl û kundir e
 Xemla wêranê şitl û kundir e
 Cewabek hat, Temo çû jor e.

Edla rabe sibe ye edla

Edlê rabe sibe ye
 Şilyê rabe sibe ye
 Teq û reqa derge ye
 Qirqîra dikê me ye
 Dema nimêja te ye
 Kî nimêj bike feyde ye
 Ev xêr e, ne gune ye
 Deynê min li bavê te ye
 Mêrkê fileh şade ye
 Şadeyê min û te ye
 Zozana hoy zozana
 Mala Edlê li zozana
 Lê da bakî ezmana
 Dêrdê Edla min giran e
 Da ser dêrdê bira ne
 Zeviyê, hoy zeviyê
 Mala edlê li zeviyê
 Lê da bakî gemiyê
 Dêrdê Edla min giran e
 Da ser dêrdê hewî yê
 Li kaş e, hey li kaş e
 Qutkê şilyê qumaş e
 Qutke Edlê qumaş e
 Edlê mêr kir belaş e
 Şilyê mêr kir belaş e
 Hoye nayê, nayê, nayê
 Şilyê ji govendê nayê
 Hoy nayê, nayê, nayê
 Bêşermê bêheya yê
 Heya li rûkê nemayê
 Avkê rûya teqya ye

Tim li pey soza xwe nayê
 Min di pozê bavê gayê
 Seh li pozê bavê gayê.

Pismamo

Pismamo lazim, lazim
 Ez xulamo lazim, lazim
 Ez du tiştê ji te dixwazim
 Kil û neynik, cotek bazin
 De bila te li Cizîrê bigota
 De bira te li avayê bigota
 Da min çaniya zî bifirota
 Bazin kît bû, bikira cot e.

Zeyno

Hey berde, berde, berde
 Hoy Zeyno berxa berde
 Her çi ya ji Zeyno xeber de
 Sê xençer li singê zer be
 Wa li ser coyê, li ser coyê
 Mala Zeyno li ser coyê
 Av kişand û bi çingoyê
 Xira kir gundê Zaxo yê
 Wa li ser dikê, li ser dikê.
 Av kişando bi elbikê
 Xira kir gundê Dêrikê
 Wa li ser birê, li ser birê
 Av kişando bi zincîrê
 Xera kir gundê Cizîrê.

Siltanê

De lê lê Siltanê
 Çêlekdoşê bêrivanê
 Mastfiroşê pere kañê
 Pere mane ser dikanê
 Ser dikana Silêlamanê
 Silêmanê Omerî
 Pezê Silto pezê kel e
 Pezê dêlê pezê kel e
 Ser dolika girt mexel e

Ne hol im, ne holvan im

Ne hol im, ne holvan im, lê lê holê
 Ne hol im ne holvan im, reben holê
 Ne gul im, ne rîhan im, lê lê holê
 Ne gul im, ne rîhan im, reben holê
 Berdêliya Elî Xan im, lê lê holê
 Berdêliya Elî Xanim, reben holê
 Çûme deriyê dadayî, lê lê holê
 Hatime deriyê dadayî, reben holê
 Kulav û doşek radayî, lê lê holê
 Kulav û doşek radayî, reben holê
 Min û holê paldayî lê lê holê
 Min û holê paldayî, lê lê holê
 Min û holê paldayî, rêbên holê
 Di sorgula hildayî, lê lê holê
 Di sorgula hildayî, reben holê
 Yek yar û yek dest dayî, lê lê holê
 Yek yar û yek dest dayî, reben holê
 Çûme deriyê daxistî, lê lê holê
 Çûme deriyê daxistî, reben holê
 Kulav û doşek raxistî, lê lê holê
 Kulav û doşek raxistî, reben holê
 Di sorgul û bişkivî, lê lê holê
 Di sorgula bişkivî, reben holê
 Yek yar û yek destgirtî, lê lê holê



Yek yar û yek destgirtî, reben holê.

Bulbulo

Bulbulo bulo bulo
 Bulbulo seyraniyo
 Çavê reş kaniya kilo
 Bulbulo seyraniyo
 Min dostek miqabilo
 Bulbulo bulo bulo
 Ez bilim bilê dîn im
 Bulbulo seyraniyo
 Şev û rojê dixwînim
 Bulbulo seyraniyo
 Aşiqê bejna şêrîn im
 Bulbulo seyraniyo
 Ez bilim bilê ker im
 Şalûr bulbulê ker im
 Şev û rojê digêrim
 Bulbulo seyraniyo
 Aşiqê bejna girover im
 Bulbulo bilo bilo
 Aşiqê bejna girover im
 Bulbulo seyraniyo
 Ez bil im, bilê lal im
 Bulbulo seyroniyo
 Şev û rojê dinalim
 Bulbulo bilo bilo
 Şev û rojê dinalim.
 Bulbulo bilo bilo
 Aşiqê bejna şapal im
 Bulbulo seyranî yo.

Tenûnê

Tenûnê hoy tenûne
 Kewlo reşo tenûnê
 Guriyê girto kemînê
 Ku ti ji fila nemînê
 Taze me, hoy taze me

Genmokê ribasê me
 Şêxa dîn ez ya te me
 Me li Hêzilê derbas e
 Me li Xebûrê derbas e
 Golik ketine ribasê
 Bû şerê mam û birazê
 Bû şer û xal û xwarzê
 Mam û birazê kî ji wan e
 Xal û xwarzê kî ji wan e
 Şerê ji mala şêran e
 Mêrê ji mala mêran e
 Girdîsa hoy girdîsa
 Haco dîno girdîsa
 Kew firin çûne lîsa
 Keçkê Batîya ser kîsa
 Yên demanya werîsa
 Hat karwan û hat karwan
 Hat karwanê van keran
 Danî li herfa bênderan
 Danî li milê bêndaran
 Eyşo û Fatê helandin
 Kirne milê kembera
 Hat karwan û hat karwan
 Hat karwanê qereşa
 Danî li girê qereşa
 Eyşo Fatê helandin
 Kirne şorba nexweşa
 Hat karwan û hat karwan
 Hat karwanê Mêrdînê
 Danîbû li girherîne
 Eyşo û Fatê helandin
 Kirne darê mêzîna
 Jina mêr ne tu yar e
 Çara reş ne tu çar e
 Hemalî bide hemalî
 Hemalî bide li vir da
 Mala Silêmanê Biro


Avaşîn salek li pey xwe hişt

Kovara Înstîtuya Kurdî ya Stockholmê Avaşîn, gihişt hejmarê xwe ya 6'an. Di vê hejmarê kovarê de, gelek nivîsên cihêreng ên çandeyî cih digirin. Kovar bi pêşkekê dest pê dike û tê gotin ku kovarê salekê xwe tijî kiriye. Digel vê yekê di pêşkekê de qala nixxandinên çapemeniya kurd ên li ser hejmarê 5'an jî tê kirin.

Piştî pêşkekê nivîseke li ser Îsmail Beşikçi cih digire, sernavê vê nivîsê "Îsmail Beşikçi mirovekî çawan û çilo ye". Di hejmarê 6'an a Avaşîn de nivîseke Haydar Diljen li ser zimên û şexsiyeta neteweyî cih girtiye. Nivîskar di vê nivîsê de balê dikişîne ser tîkiliya kesayetiya neteweyî û zimanê zikmakî. Di kovarê de nivîsa herî berfireh a Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan e. Ev nivîsa bi navê "Di prosesa şoreşê de wêje û rewşên", ji hêla Robîn Rewşen ve ji tirkî hatiye wergerandin. Her wiha di nava rûpelên kovarê de nivîseke Robîn Rewşen bi xwe jî cih girtiye, sernavê vê nivîsê "Şehadeta Wedat Aydın û Serhildana Amedê" ye.

Di vê hejmarê kovarê de, Mamosta Amed Tigrîs li ser hinek pirsgrîrêkên zimanê kurdî rawestî-

yaye. Mamoste di nivîsê de balê dikişîne ser arîşeyeke zaravayê kurmançî û digihêje vê encamê ku di peyvên ku bi tîpa /s/ dest pê dikin de gava li pey wê tîpên "k,l,t,p,w,r" bibin pêdivî bi tîpa /i/ nîn e



ku bikeve navberê. Her wiha ew balê dikişîne tevliheviya di nivîsandina peyvên biyanî de. Li ser vê pirsgrîrêkê jî pêşniyara wî ev e ku heta ji mirov bê, divê mirov wan nêzî orjînalê binivîse.

Di nava vê nivîsê de Mamoste

Tigrîs rexneyê li redaksiyona Azadiya Welat digire ku bi dîtina me ew rexne ne cih de ye. Pêşî mamoste dibêje ku ew peyva "Îstanbul", wekî "Stanbol" dinivîse û em peyva wî dikin "Stenbûl", li gorî zanîna me di rojnameyê de ew peyv her tim wekî "Stenbol" hatiye nivîsîn, tu car nebûye "Stenbûl". Li aliyê din mamoste bi xwe jî di nivîsa li ser biwêjan de heman peyv wekî "Stenbol" bi kar anîye.

Ji bilî vê nivîsê, Î. Nasso li ser "Daçekên kurdî" nivîsek darîjtiye, nivîs hêja ye, lê hin xal hene ku em ne pê re ne. Di vê nivîsê de birêz Nasso qala daçekên "hevgrîti" dike, du daçekan bi hev ve, mîna jibo, jiber, jinav, liser, liba...dinivîse, lê bi dîtina me ew du daçekên ji hev cuda ne û divê mîna ji bo, li ser, li nav, ji nav... bîn nivîsandin.

Di kovarê de gelek kesên wekî, Selîm Biçûk, Zekî Seyda, Ahmed Hüseyîn, Leyla Stêrk, Kerîm M. Baqustanî, Mehfoz Mayî, Yekzan û Necîb Balayî bi berhemên xwe cih girtine. Tevî ku piraniya nivîsan bi kurmançî ye jî, hinek nivîsên bi soranî jî di vê hejmarê Avaşîn de balê dikişînin.


Nûbihar derket

Kovara Nûbihar bi hejmarê xwe ya 55'an derket pêşberî xwendevanan. Di vê hejmarê de gotar, çîrok, helbest, serpehatî, lêkolîn û hwd. cih digirin. Berbirsê Karê Nivîsaran ê Nûbiharê Süleyman Çevik di nivîsa xwe de li ser dîroka bêtifaqiyê rawestiyaye. R. Karakaya qala gundê xwe (gundekî Mus'ê) dike û jiyana gel a sala-wext radixe ber çavan. Ferit Îzol bi sernavê "Dewlet û sazûmana dewletê" de, pêwistiya dewleteke ji bo gel û şertên ji bo dewletbûnê şîrove dike.

Di vê hejmarê kovarê de, encama civîna duyemîn ku li ser kirmanckî (kirdkî) tîr çêkirin, cih girtiye. Biradost li ser jiyana Mela Xelîlê Sêrtî (1750-1843) lêkolînek kiriye. Dîsa çîrokeke Nûbar Asan û Zarokname di vê hejmarê de cih digire. Di kovarê de digel çend helbest û wergerên Berpîrsê Giştî yê Nûbiharê Sabah Kara, M. Seîd Cubeyr, Hesên Zinar, Xweşbêj û Î. Omerî jî bi berhemên xwe balê dikişînin. Her wiha di vê hejmarê de bangeke M. Emîn Bozarslan ji bo ku sala 1998'an bibe sala çapemeniya kurdî, cih digire.

SERWISA ÇANDÊ

Nûbihar



Li Serhedê HADEP Û Gel Bûne Yek

OSMAN ÖZÇELİK



Ji otobûsa HADEP'ê ya ji HEP'ê mîna xelatek bapîran maye, di zivirokên Çiyayê Agirî de dengê starana "Berzî Berzî!" difûriya. U berfa serê Çiyayê Agirî, bi ewrên berfin re hevaltiya xwe ya bi hezar salan didomand.

Çiyayê Agirî piştî şikesta Îhsan Nûrî Paşa û hevalên wî 56 salan reş girêdabû û di şînê de bû. Me dît ku Çiyayê Agirî mîna bûkeke nû, xwe jî nû ve xemilandiye ku neviyên Îhsan Nûrî Paşa bûne xwazgîniyê wê. Bi vê çîyê em kirin mêvan û bi vê çîyê zarokên Agirî, zarokên Zîlan zarokên Behra Wanê û zarokên Zapê bi du tiliyan tîpa "V" çêdikirin û li ber mûzîka kurdî ya ku ji otobûsa me difûriya di cih de dilîstin.

Ev serê deh rojan e ku heyeta HADEP'ê di gera bajarên Serhedê de ne. Heyet di lêkolîna rewşa gelê kurde de ye.

Piştî Qers û Ardahanê em hatin Bazîdê. Li Bazîdê gel; êl bi êl, pêl bi pêl hatibûn pêşwaziya me. Te digot qey gel, ji berhema "Efsaneyê Çiyayê Agirî" ya Yaşar Kemal wisa hatiye der û li qada navendî ya Bazîdê bi cih bûne û bédeng li hêviya me ne. Bi dengê strana Berzî,

gel liviya, pêl da, berê çepik paşê dirûşmeyên "Bijî Aştî, Bijî HADEP" teqiya. Me sipasiya xwe bi ziyaret û tewafa gora fîlozof û alimê kurd Ehmedê Xanî pêşkêşî bazîdiyan kir.

Piştî Agirî û Diyardîne em gihîştin Patnosê. Li Patnosê, serokê HadeP'ê yê beşa Patnosê da pêşiya gel û gel mîna gurzên pîrîskan bi me re herikîn. Otobûsa me heta çarşiyê, di riya 2-3 kilometre re, di saetekê de nikaribû derbas bibe. Gelê Patnosê provayêke serhildanê nîşanê me da.

Li her derê dirûşmeyên aştî, azadiyê û çepik hebûn. Belê li Wanê bi hezaran kal û pîr, xort û keçan em bi germî hembêz kirin û me bi şahiyek mezin ber bi Culemêrgê bi rê kir.

Rojek berê gerîla bi roketan êrîş biribûn ser Tabûra Hekariyê. Me hesaba çûyin û neçûyîne kir û me biryar da ku em bernamêya xwe neguherin. Em bi çemê Zapê ketin Hekariyê. Em li Hekariyê man heyirî ku, bê mirovên li wir di nav xwezaya hişk û hov de çawa wisa diltenik in û di nav dorpeçana tank û panzêran de çawa wisa bêtirs in. Timên taybetî ji me re îşaretê "gurêboz", zarokên qoricîyan jî îşaretê me "V" çêdikirin.

Li Mûşê em bûn mêvanê baranê. Jinên Mûşê bi çarşefên xwe yên reş, bi pantorên qot û bi destmalê serê xwe em vexwandin. Di destên hemûyan de perperika HADEP'ê hebû. Di binê barana bi şerpîn de bi hezaran kesan li me guhdarî kirin û yek kes jî ber baranê nereviya. Digotin: "Bixîfîn, bixîfîn!" Çavên me û objektîfên wênekêşan bêhemd jinên bi çarşefên reş ku ala HADEP'ê dihejandin zûm dikirin. Bi

rastî jî, cara yekemîn bû ku kurdên îslamî bi ala HADEP'ê em silav dikirin. Mûşiyên durûşmeyê nû diyarî literatûra HADEP'ê kirin. "Înadina HADEP". Me bi vê dirûşmeyê berê xwe da Bîngolê.

Gelê Bîngolê tirs şikandibûn û bi hezaran qada civînê dagirtibûn. Li Bîngolê jinên bi çarşef jî û yên modern girêdayî jî, ji her derê zehfîr bûn. Mela Îshak li ser otobûsê, di guhên min de got: "Ev hilweşandina Refahê ya li Kurdistanê ye". Şêx û melayên Bîngolê ji me re gotin: "Hûn li-kum û şaşikên serê me mêze nekin. Em bi dil û can bi doza xwe re ne. Şewitandina daristanên Bîngolê bi wan gelek giran hatibû."

Li Elezîzê, elezîziyan gazin kirin ku çima em bi ser wan de naçin û me çima Elezîz bi destên faşîst û kontrayan ve berdaye. Bi wan kurd roj bi roj Elezîzê bi dest xwe dixin. Ku em jî parîkî alîkariyê bidin wan, wê Elezîz jî bikeve û wê bibe Bîngol. Me ji çirûska çavên wan fêhm kir ku ew rast dibêjin. Emê dîsa werin.

Meletî, ji Meletiyê re xebatek bi rêk û pêk divê. Mixabin ev bajarê kurdan di destên Refah û gurebozan de ye.

Li her bajarî me serdanek da rêxistinên sîvil û demokratîk. Gava me ji wan re digot êdî cerdevan û leşker jî silava me digirin û me silav dikin, wilo şîrove kirin: "Daxwaza aştiyê bûye daxwaza gel û gel ji HADEP'ê bi hêvî ye ku wê aştiyê pêk bîne. Gel ji HADEP'ê bi bawer e."

Mesela Xalê Remo-Hevala wî Virên bav û kurê wî

Nofê û xelkê

Rojekê Xalê Remo bi hevalê xwe ve dixwazin herin serdana kirivê xwe. Lê kirivê wan li herêmeke din e. Wexta ku Remo û Nofê bi rê dikevin; Remo li kerê xwe siwar dibe, Nofê bi peyatî li dû dimeşe. Qederekê dimeşin, li pêrgî (rastî) mirovînan tên. Mirov ji Remo re wiha dibêjin:

“Ma tu di kîjan wextê de yî? Tu siwar î, hevala te peya ye, ma ev ne şerm e? Remo difikire, maf dide wan mirovan. Peya dibe, Nofê siwar dibe û ew bi xwe peyatî dimeşe. Dîsa pêrgî mirovên din tên. Ew mirovan jê re wiha dibêjin: “Tu çawa zîlam î? Hevala te siwar e, tu peya yî?” Remo, demara kevn davêje serê wî û maf dide wan. Îcar ew jî li kerê xwe siwar dibe. Ew li pêşiyê, hevala wî li paş wî dimeşin.

Piştî qederekê meşa wan, li pêrgî komek mirovên din tên. Ji wan re wiha dibêjin: “Ma ne guneh e, hûn her du li wî kerê reben siwar bûne.” Remo disekine û kûr kûr difikire. Remo û hevala xwe her du jî ji kerê peya dibin. Didin dû kerê xwe û peyatî dimeşin.

Îcar hinek mirovên din li pêrgî wan tên û ji wan re wiha dibêjin: “Hûn çiqasî bê



aqil in, hûn her du bi peyatî dimeşin û kerê we vala ye. Tew nebe yek ji we siwar bûya, yek ji we jî peya bûya, hûn ne baştir bû?” Remo disekine, difikire û dibêje: “Ez çawa bikim, ez çi dikim, kes naecibîne.”

Piştî ku difikire, dibêje: “Her wekî pêşiyên me gotin devê xelkê doxîna mirove ku mirov girêde. A baş fikra min bi xwe ye.”

HUSEYİN TURGAY

kurê wî

Bav û kurê xwe nêçîrvan in. Lê belê bav pir viran dibe.

Bav rojekê ji kurê xwe re dibêje:

“Kurê min ezê îro li civatê vîreke mezin bikim, ku bi te gelek hat, tu bikuxe. “Bav û kurê xwe diçin civatê, bav ji civatê re dibêje:

— Îro min roviyek dît... Dêla wî penci gaz (metro) bû.

Kurê wî dikuxe. Bav gazê dadixe çilî.... Kurê wî dîsa dikuxe.

Bav gazê dadixe sihî... Kurê wî dîsa dikuxe.

Bav gazê dadixe 25, 20, 15, 10, 5... Her ku bav gazê dadixe kur dikuxe. Bav ji penc gaza dadixe 4,3,2,1. Gava ku bav gazê dadixe yekê... Bi reneki asayî kuxuka kurê wî tê, xwe nagire û dikuxe. Bav dibêje: “Ma mîratê rovi bê dêl bû?”

BI XELAT...

XAÇEPIRSA BI XELAT (88)

XAÇEPIRSA

Amesgeh Schêdêk (wêz)	A	Pehîrêk Ev na	A	Çê Yekîtîyê Neteweyî	G	Hecetê Kurteya peyvan tirk	A	Mam. Serhildêr Endam	A	P
3	A	K	Î	F	Y	I	L	M	A	Z
Hîman Dêçêk	A	S	A	N	Madekîrî Rohar	R	Û	Z	A	R
E	P	A	T	Hemî	Ç	Di karekî rû saf	R	A	Ajansêk tirkî	E
Di tîrê dest Çîvêkêkî hesene	E	L	T	E	R	Î	A	X		
L	E	M	N	E	M	A	Hewl. danaw. Hîman	A	T	
Ev girî Tîpeke kurdî	Î	Ş	E	V	F	A				
Kawarêkê kurdî Di tîrê dest	A	V	A	Ş	Î	N				
Repa bert girêdê Çêk	Î	N	Î	E	N	Î				
	A	S	O	T	R	Ê	N			

PEYVA VEŞARÎ → (A) (P) (E) (M) (G) (S) (A)

Bersiva Xaçepirsa 86'an

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, emê wan binirxînin û bi rîya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 88'an, Kasteta Boğaziçi Gösteri Sanatları Topluluğu (KARDEŞ TÜRKÜLER) e



Jêrenot:
Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîşin û tevî navnişana xwe ji me re bişînin.

Penc kesên ku xelata xaçepirsa hejmara 86'an Kasetê Xelîl Xemgîn (NAME) qezenç kirine; Tuncay Bal/Manisa, Ali İzzet/Enqere, Mustafa Okçul/Qeyserî Zeki Bilgin/Stenbol, Azad Değirmenci/Mêrdîn

Temartin Helbetvan eki kurd (Wêne)	Jêhatî Gayê ciwan	Bi farisî av Xerîb	Baweriyek e oli Bi tirkî baneşanek	Paşeroj Şewe	Îsandin dema borî
3					
Gêre	2		Eşq	5	
Cinavkek			Hîman		
		Bi kurdî 'erê'	Wana (devokî)		
			Didan		
Tovê...					Kurteya Doza Neteweyî Tîpeke dengdar
Kavil					
4		Hacetê cot		1	Televîzyon a kurdî Kovarek
		Kûçik			
Ne xerîb			Îsm		
Cejn			Ax		
6		Xak		Dijberê erê Tîpeke kurdî	
		Dîn			
Berepaşkî daçekek Enîşk		Baneşane k		Tîpek	
				Azot	
					Qertafa neyîniyê

PEYVA VEŞARÎ → 1 2 3 4 5 6



Jûwîna şarê mawa yena nezdî

Dewleta tirk 4-5 serî yo ke hetkarîna Barzanî başûrê Kurdistanî kerd bi zey raya eynî. 2 mangan de finê, 3'ê mangan de finê topana, tanqana, panzerana, teyarana û 10 hezaran eskêrana zek şiro, eynî şiyê Başûrê Kurdistanî û her şiyayin de vatê: No şiyayin peynî yo, ma dê biqedînîm, ageyrim û fina şiyayin rê gerek do, nêmano.

14'ê menga gulan a emşer de jî wina vat û wina kerd. Zek yeno zanayin û vîrî dewleta tirk menga gulan de tankana, panzerana, topana teyarane şeriya, helikopterana û nezdiyê 150 hezar eskêriya başûrê Kurdistanî rê jew operasyonê bandorkerdino newe viraşt.

Armançê nê operasyonê bandorkerdin, ê verînan ra gird bi. Çimke 1983 ra, nê kişt nezdiyê 190 operasyonê bandorkerdin viraşt, la belê armançê nê operasyonan, no operasyonê ke menga gulan de viraşt, hendê ey gird nêbî. Armançê dewleta tirk nê operasyonê de 2 seatan miyande 2 hezarî gerilay kiştin û hemû qampanê gerilayan jî vilakerdin bi. Hetanî 14'ê menga hedreyina xo kerd û 14'ê menga gulan de peşmerganê PDK wa piya gerilayan rê vardayin viraşt û vat qayê raya

başûrê Kurdistanî zey verî raya eynî ya û gerilayê wija pawenê ke dewleta tirk û PDK berê û ci bikşê.

La belê gerilayanê ARGK ji hedreyinê xo kerd bi. Coka dewleta tirk û PDK zek vardiyê sî, serhewadayinê gerilayanê ARGK vejyay ci ver. Senî ke serhewadayinê gerilayan vejya ver dewleta tirk jû kişt ra zey verî ferman da rojname û televîzyonan de xo û zey verî, înan jî nûst û televîzyonan de vat "mehmetçikî qampê gerilayan kerdî vîla" "gerilayê geste mirene" "Zap kewt memetçikî dest" û zew bî. Jû kişra jî PDK wa piya vardayenê xo açarnay hetê sivilana û Hewlêr de nêweşxaneyê "Heyva Sor", Şaxê NÇM'yê Hewlêr, rojnameyê Welat û Welatê Rojê rê vardayin viraşt, 58 sivilî kiştî. Gerilayanê ARGK jî verê xo açarna, hetê PDK û dewleta tirk û serhewadayin û vardayinê xo kerdî vêşî. Jû kişt ra, gerilayan başûrê Kurdistanî de cayan de PDK û dewleta tirk rê vardayinê întarî viraştî û jû kişt ra jî koyan û mirxanandê Başûr de dewleta tirk û PDK rê vardayinê viraştî 4 helikopterî û jû teyare wa şerî day waro. Dewleta tirk verî helikopterî warodayin qebûl nêkard, la belê pey ra nê helikopteran ra 2 helikopterî warodayin qabûl kerd û vat: "Gerilayan deste fuzeyê Sam-7'an

estê. Nê warodayinan peyra moralê dewlet zaf xerpiya. Çimki nê helikopteran miyan de serdarê artêşa tirk û sermayanê serê lîminî estî bî.

Vardayino peyin

La belê nê vatenan ser ra, 4 mengî ravêrd, nêravêrd, dewleta tirk Başûrê fina vardayin viraşt û vatenê ci fina zey veriyê: "Mayê biqedînîm û ageyrim". Nê vardayinê peyinî ser, Serokê PKK Abdullah Öcalanî Med-TV de vat: "Barzanî veyndart artêşa tirk û vat: "Ek şima mey rê ezo biremî" Rastî vardayinê peyra jew serdarê PDK vatenê Öcalanî kardî rastî û vat: "Ma pey hesyayim ke gerilayê ARGK'yê, Zaxo rê vardayino gird viraşt, qandê coya ma artêşa tirk ra hetkarînan wast."

Oyo winî ayseno ke, dewleta tirk ewro meşt (siva) fina vajo, "Ma qedînay, ma kerdî vilay, iyê meşê fina bêrê pêser" û awa ageyro. Çimke dewleta tirk û PDK wa, piya iyê her roj zey zompî, gerilayan ra darbey genê û nê darbeyê jû kişt ra, îflaskerdin û qedayina dewleta tirk û PDK anê nezdî. Jû kişt ra wextê remayinê Barzanî anê nezdî, jû kişt ra jî jûwîna şarê kurd anê nezdî.

MEMED DREWŞ

albanî: arnawûd
ast: teng, doş, sewiye, rade
balkêştirîn: seyrtirîn
berbendkirin: astengkirin,
bêje: peyv, wişe, kelîme
bi asanî: bi hêsanî,
bijîşk: doktor
cobar: robarok, çay
dibistana seratayî: fêrgeh
 pêşin
derûnî: giyanî, ruhî
hêwirgeh: xan, otel
hilçirandin: hildirandin

Ferhengok
jîwar: hawirdor, jîngêh
keval: tablo
kevneşopî: dabûnêritî
kilandin: çelqandin
kuvî: hov
mebest: niyet
mêşmorî: kelmêş
mijokdarî: mêtînger
nixumandin: sergirtin
parêzgeh: biryargeh
pesendkirin: tesdîqkirin

pêpelûk: qonax, pêngav,
pixarê: şivirê
ramîn: fikirîn, hizirkirin
saw: tirs, xof
serheng: nefer
şande: qasid, elçî
şarezahî: şaristanî,
şepol: pêl
şewe: awa, şikl
xerîtok: talaş
xeratî: marangoz
xilmaşî: xewok,
zêrandin: azirandin,

WELAT

**Rojnameya Hefteyî
(Haftalık Gazete)**

**Li ser navê
Zerya Basın ve
Yayıncılık
San. Tic. Ltd. Şti.
(adına)
Xwedî (Sahibi)
CELALETTİN
YÖYLER**

.....

NAVNÎŞAN
Ayhan Işık Sk. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL
TEL-FAX
(0 212)
251 90 13

.....

**Gerînendeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
SAMİ TAN**

.....

**Berpîrsê Karên
Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
M. SALİH TAŞKESEN**

.....

**Berpîrsê Saziye
(Müessese Müdürü)
TAHİR ELDEMİR**

.....

ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık
A.Ş.

.....

BELAVKIRIN
BİRİYAY Dağıtım

.....

**NÜNERİTİYÊN ME
(Temsilciliklerimiz)**

Munchen:
(Nünerê Giştî yê
Ewropayê)
Mahmut Gergerli
49 871 67 08 84

Brüksel:
Medenî Ferho
32 532 721 12 03

Suriye:
Jana Seyda
Helim Yûsiv

Berlin:
Silêman Sîdo
00 49 30 691 6495

Hannover:
Selîm Biçûk
49 572 18 13 60

Stockholm:
Robîn Rewşen
46 87 51 05 64

Bonn:
Ahmet Baraçkılıç
49 228 66 62 49

Hollanda:
S. A. Fewzî
31 104 85 55 43

Hunermend Hejar Îsa: Huner dokûmendkirina bûyerên dîrokî ye

Helebçe, ji bilî rengê reş bikaribim çêbikim û çawan ezê vê tariya bê dawî ji bûyeran, bi rengên din çêbikim. Ez bawer im di nava vê tariya bi êş de, roniyek bi hevî xuya dike û wê rojek bê ku reng vêbin û wê reşiyê binixumînin.



HUNERMEND HEJAR ÎSA

Bêhtirîn kevalên (tablo) te nîzîkî moralên bêhişiyê dibin (ango helbestî) wekî din helbest û reng hev û din temam dikin, gelo tu nabîni ku rengên qebe (yên helbestî) çawan diêşînin, tu çawa wan rengan wekî helbest li hev siwar dikî?

● Di destpêkê de, ez wekî te nabêjim: "Nêzîkbûna keval li helbestê" ji ber ku di baweriyê min de keval û helbest her du yek in, tevî ku her yek bi şeweyekî tê raxistin; keval bi wêne û rengan û helbest jî bi ronî û birûskê ku di cîhekî de tu bi gotinan pesin bidî. Lê ku tu jî helbestan hez bikî ev problema te ye.

Û li ser siwarkirina rengan: Ê wan panavên spî tevî hevîrekî ji rengan dikim, ew hevîr hinekî jî mîrala min e, hinek jî mebesta min e. Daxwaza ku ez pê hest dibim, ta ez bigihêim baweriyekê ku pêşî li bal min xweşik bûye û ez naxwazim ku di dema ku ez kevala xwe çêdikim de kesê sêyemîn beşdarî min bibê.

Pîrek di kevalên te de wînda dibe, çaxa di qurzikên bêguhndan de derdikevin wekî tu ji qazî ve wisan dike?

● Windabûna pîrekê di hin kevalên min de, ne nişana vê yekê ye ku ez wê bêbûna dibînim, berevajî, di gelek karên min de, pîrek bîngeha kevalê ye. Ji ber ku di baweriyê min de tu gewdanî û canî wekî pîrekê xweşik tune ye. Ji ber vê yekê ew bi tena xwe sêwîna hunermendan e û xuyakirina wê di qazîkên bêguhndan de bi wateya pîvanê ji panava rengan, ne ku em rola wê di lîva kevalê de tune dikin, di gelek caran de bandora rengê xurt û xweşik vejîneke bo livandina hemû perçeyên kevalê. Ango buhabûn û erzanbûna pîrekê ne ji

diyarkirina wê di qurzikên bêguhndan yan di panaveke hindik de xuya bike tê.

Kevala te ya ku, te li bajarê Qamişloyê raxist min tê de dîroka mirovan û derdê kurdan dît. Windabûna wan ji dema bûyîna dîrokê ta van demên dawî behêd e, gelo tu ne bi min re yî ku ev babet bi rengê tenê te çêkîriye û ew jî rengê reş e?

● Huner bi gelemperî neynik e ji jîwar re, ev di pêpelûka yekemîn de. Ya duyemîn; pergal û hêzên psikolojîk di nava mirov de têne kilandin. Vê babata duyemîn ezê bihêlim ji carekê din re.

Ji bo ku keval rast be, divê neynik be ji jîwar re, çimkî armanca hunerê li jiyane nîhêrtin û dokûmandkirina bûyerên dîrokî yê girîng ku li dora me çêdibin e, bi şeweyekî ku temaşevan bikaribe van bûyeran bibîne û pê re bê kilandin diyarkirina wan e... û di dîrbûna van demên ku di ser mirovahiyê û di ser kurdan derbasbûne de min roniyek pîsik jî nedîtîye, ji bo ku ez karibim wan bi rengên hevîdar çêbikim. Ezê çawa bêtara Helebçe, ji bilî rengê reş bikaribim çêbikim û çawan ezê vê tariya bê dawî ji bûyeran, bi rengên din çêbikim. Ez bawer im di nava vê tariya bi êş de, roniyek bi hevî xuya dike û wê rojek bê ku reng vê-

bin û wê reşiyê binixumînin.

Ez dibêjim, hunermend tune ye ku karibe, kul û derdên xwe di kevalên xwe de diyar bike. Ji ber ku eşkerekirin, ketina kevalê ye. Ya duyemîn: Lihevsiwarkirina rengên xêzik û pîvanên hunerî jî ferezî û bi cih re, kevalê xwe bi xwe bîngar dike, keval dinêrîna min de bi pîrbûna wêneyan qels e dibel?

● Rast e; xwe eşkerekirin, hunermend dike mirovekî çavdêr û huner, ne çavdêriya bûyeran e. Belê huner, noqûbûna nava bûyeran û kilandina di hundir de ye. Li vir ez diwazim bibêjim ku bêhtir kevalê ku min çêkirine, nava ferezîyan û xweşikbûna cih dibêje, ne cih bi xwe. Ferezîyeke wekî Selahedîne Eyûbî di kevala min a bi navê "Dîroka mirovan" de ne ferezîya Selahedîn bi xwe ye, lê belê ferezîya kurdekî leheng mîna Selahedîne Eyûbî ye.

Gelo rengên hene bi te nexweş in? Ez dibînim tu ji wekî min hez ji rengê şîn dikî, tu ne bi me re yî ku şîn ne rengê tenê ye, mirov dikare bibêje ku ev xewneke bêhişiyê ye, dînitî ye?

● Ligel ku rêza min ji nerîna te ya li ser rengan heye jî, lê hebûna rengên şîn ne di panava spî de, ango ez ne bi vî ren-

Hejar Îsa kî ye?

Di sala 1970'an de li Qamişloyê ji dayik bûye.

Di sala 1993-94'an de fakûlteya hunerên çak li Şamê kuta kiriye. Di salên 1992-93-95'an de beşdarî hinek pêşangehên hevbesî bû. Di navenda çandî ya rûsî û salona Elşe'b li Şamê. hwd.

gî yan bi yê din re me. Bala xwe bidê, ez dibêjim pêrebûn û ne jê hezkirin, ji ber ku min hez ji rengan bikira ta vê pêpelûka ku tu dibêji, ango ez bi vî rengî ve girêdayî me û ez naxwazim bikevim xefka rengê tenê. Rengê bi tena xwe nikare di hundirê kevalê de xurt û berz be.

Daxwaza hunermendan ev e ku bigihêjin kevaleke békemanî. Gelo tu gihîştî ve babetê?

● Ê ku bala mirovan ji hezar salane kişandîye ew kêmanî ye û ta niha tu kes negihayeyê ku tiştêkî békemanî pêk bîne. Di gelek cihan de ez bi xwe di tiştêkî wisan de neramiya me, ji ber ku gava keval bigihêje asta ku békemanî be, wekî ku tu dibêji, divê ez dev ji kevalê berdim, ji ber ku tiştêkî jê çêtir nikarim bidim. Piştî wê tiştêkî tune, wisa wê keval bimîne kêr, ev e sedema ku mirov herdem li xweşikbûnê digere.

Pêşeroj ji hesin re ye, ji komputerê re ye, hunerên çak, çawa wê xwe xelas bike, di vê lehiya mezin de di jiyana me de, ango televîzyon, peyk û internet...

● Ev bûyera hemdemî (derbasbûna kompûter) yan ev şoreşa informasyonê (zanîne) ya ku ketiye jiyana me ya rojane, tevî ku hîn dîrî me ye, lê di demên tîn de wê hebûna wê bibe pêwistiyek di jiyana me de, her wekî çawa anîha li bal hinekên din wisa ye. Tiştêkî xusûsî ye ku hunerî celebên edebî tev bikevin navê şoreşê. Lê çawa emê hunerê biparêzin, ji hunerê turiya revînê tune ye, ji bilî ku bikaribe sudeyekê ji vê şoreşê bibe û bigihêje asta ku kompûterî teknîka nû bixe xizmeta xwe.



Du tabloyên hunermend Hejar Îsa

